ÇAND Û SINC

AMADEYÎ

1

2019/2020

AMADEKAR

Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Çand û sinc ve hatiye amadekirin.

LÊVEGER

- Komîteya Şopandinê

- Komîteya Fotoşopê

- Komîteya Redekteyê

Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.

NAVEROK

BEŞA YEKEM 7

ÇAND ÇI YE? 8

ÇAND Û JIYANA CIVAKÎ 13

NIRXÊN ÇANDÎ YÊN BINGEHÎN ÊN MIROVAHIYÊ 17

DI ÇANDÊ DE TAYBETMENDIYA GERDÛNÎBÛN Û HERÊMÎBÛNÊ 21

BELAVBÛNA ÇANDÊ 24

BEŞA DUYEM 27

QADA HIZIR Û ZIMAN 28

QADA ABORÎ Û HUNERÊ 31

QADA POLÎTÎKAYÊ 36

QADA ZANIST Û TEKNÎK-TEKNOLOJIYÊ 39

BEŞA SÊYEM 43

SINC ÇI YE? 44

DI CIVAKÊ DE HIZIRANDINA BAWERIYÊ Û GIRÊDANA BI SINC RE 48

SINC WIJDANÊ CIVAKÊ YE 51

DI SINC DE BERPIRSIYARÎ 57

TÊKILIYA OLÊ YA BI SINC RE 60

VEGERA SINCÊ CIVAKÎ 63

ALIYÊN SINCÎ YÊN TÊKOŞÎNÊN AZADIYÊ-1 66

ALIYÊN SINCÎ YÊN TÊKOŞÎNÊN AZADIYÊ-2 70

BEŞA ÇAREM 73

ERDNÎGARIYA MEZOPOTAMYA Û ÇANDA ARYEN 74

BELAVBÛNA ÇANDA ARYEN 78

CIVAKÊN ETNÎKÎ YÊN LI MEZOPOTAMYAYÊ-1 81

CIVAKÊN ETNÎKÎ YÊN LI MEZOPOTAMYAYÊ-2 85

ÇANDA SEMÎTÎK 88

ŞARISTANIYA MISIRÊ..90
ŞARISTANIYA ÇÎNÊ..94
ŞARISTANIYA FENÎKEYÊ 97
ŞARISTANIYA GRÎKO-ROMEN 100
EMERÎKA 103

BEŞA YEKEM

ÇAND ÇI YE?

- Çand, çi ye?
- Çand û jiyana civakî
- Nirxên çandî yên bingehîn ên mirovahiyê
- Di çandê de taybetmendiya gerdûnîbûn û herêmîbûnê
- Belavbûna çandê

Wane 1

ÇAND ÇI YE?

Çand, di wateya teng de hişmendiya civakê, şêweyên hizirandina wê û zimanê wê yên ku vedibêje ye.

Di wateya berfireh de hemû amûrên pêwîst ên ku civak çêdike. Weke; xwarinên cur bi cur, veşartin, awayên veguhartinê, ragihandin, parastin, amûrên xweşikbûnê û hwd.

Mirov dikare ji bo çandê bêje: "tevî xwezayê" her tiştê ku mirov afirandiye.

Çand; nasname ye, zimanê civakê ye, têkîlî û şêwaza jiyanê ye.



Her gel û netewe, ji dîrokê ta niha nirx afirandine. Mirov dikare ji van nirxan re bêje **çand**. Di heman demê de jî, mirovahî bi van nirxên (çand) ku afirandine, xwe vedibêje.

Divê mirov, bi misogerî çandê bi qada huner, şano, fîlm, wêne, niqirandina darên cur bi cur, avahîsazî û wêjeyê ve teng negire dest. Her tiştên ku mirov di qada jiyanê de diafirîne an bawer dike ku afirandiye, an jî bawer dike ku yên wê ye, pêk tîne. Ji ber ku mirov şêwaza jiyana xwe çawa afirandiye, nirxên li ser hev kom bûne bi ceribandinê tên bidestxistin, ango çawa hatine afirandin vedibêje. Mirovahiyê, xwe bi çandê ve çawa afirandibe, ev rêbaza hilberîna çanda wê ye.



Weke peyvekê **çand,** tê wateya ajotin û çandiniyê.

Çand, têgeheke ku hemû nirxên (heyberî û rewanî) mirovahiyê di seranserî dîrokê de rave dike. Mirov di encama têkîliya xwe ya bi xwezayê re, hilberînekê derdixe holê. Di heman demê de di encama kar û xebata domandina jiyana xwe de bi mirovên din re dikeve nava têkiliyan. Lêkolînvanan der barê çandê de 164 wateyên cuda yên çandê destnîşan kirine.

Di zimanê rojane de wateyên weke; zanabûn, zîrekbûn, asta perwerdeya bilind a ku asteke wê ya ramanî heye û hwd. vedibêje. Mirovên xwedî çand; di kar û xebatên xwe yên civakî de çalakbûnê, di qada zanist, felsefe û têgihiştina civakî de asta pêşketinê nîşan didin. Di nava wateyên çandê de weke peyv; (ajotina zeviyan), şaristanî, çandinî, hemdemîbûn, mirovên rewşenbîr û mirovên xwedî çand hene.

HÊMANÊN ÇANDA HEYBERÎ Û REWANÎ

1- Hêmanên çanda heyberî

Hemû amûr û pergalên ku mirovan di encama têkiliya xwe ya bi xwezayê re afirandine, dikevin nava çarçoveya çanda heyberî. Ji bo çanda heyberî, mirov dikare bêje; ew çanda ku bi çavan tê dîtin e. Ev qad, encama karîgeriya qada rewanî ye û amûrên ku mirovan di pêvajoya pêşketina civakî de afirandine.

Çêkirina ta

Mînak: Tiştên ku mirovan di encama pêşketina teknolojiyayê de afirandine. Weke; dibistan, pirtûk, tirimbêl, cil û berg, bermahiyên dîrokî, govendên gelêrî û hwd. dikevin nava vê çarçoveyê.

2- Hêmanên çanda rewanî

Hemû nirx û pîvanên ku di encama têkiliya mirovan de nivîskî yan jî devokî bi mirovan re derdikevin holê, dikevin nava vê çarçoveyê.

Mînak: Sinc û bawerî, nirx, zagon, kevneşopiyên gelêrî yên ku jiyana civakê bi rêk û pêk dikin, şêwazê hizirê, ziman, huner, ol, felsefe û bîrdozî hêmanên çanda rewanî ne.

Civak bi çanda ku diafirîne, hebûna xwe berdewam dike. Çanda rewanî, bîra (hafiza) civakê ye.

Di seranserî dîrokê de hest û ramanên mirov bi guherînê re weke çanda rewanî xwe gihandiye ta roja me. Bi taybetî, ziman û di qada ramanê de felsefe, ol û berhemên hunerî di encama çanda rewanî de hatine afirandin. Di dîrokê de gelek mînakên wê hene. Hêmanên çanda heyberî û rewanî ku kurdan li Mezopotamyayê bi **şoreşa neolîtîkê** re afirandine; ji bo hemû mirovahiyê bûne çavkaniyên afirandina nirxan û jiyanê. Ji ber ku kurdan çandeke civakî ya kûr afirandiye, bi hezarê salan kariye xwe li hemberî siyasetên pişaftin û tunekirinê bigire.



Şoreşa Neolîtîkê

Ji bo ku sîstemên şaristanî, karibin civakê bixin bin destê xwe; di qada rewanî de qirkirina çandî pêş xistine û ta niha pêş dixin.

Divê her civak, di qada çandî de azadiya xwe biparêze. Di roja me de sîstema kapîtalîst ji bo ku aloziyê derbas bike, di tevahiya cîhanê de qirkirineke civakî pêş dixe. Bi taybetî, sîstema kapîtalîst hewl dide ku kesayetên bê dîrok biafirîne û kesayetên ku di hest û ramanên xwe de sergihayî ne, dest jê berdin.

Li gorî vê ramanê; sîstema kapîtalîst dema ku vê felsefeyê di civakê de serdest bike, wê demê dikare berdewamiya xwe bi ewle bike.

Hêmanên çanda heyberî û rewanî; ji hev qut nabin, girêdayî hev in û bandorê li ser hev dikin.

Ev her du hêman, çandê pêk tînin. A ku wateyê dide çanda heyberî, hêmanên çanda rewanî ne.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Çand, çi ye? Pênase bike.**

2- **Hevokên li jêr, sererast bike.**

- Mirov dikare ji bo çandê bêje, her tiştê ku mirov bi kar aniye.
- Lêkolînvanan der barê çandê de 146 wateyên cuda yên çandê destnîşan kirine.
- Civak, bi çanda ku diafirîne, hebûna xwe winda dike.
- Yek ji çanda heyberî, sinc e.
- Hêmanên çanda heyberî û rewanî; ji hev cuda ne.

3- **Pênc hêmanên çanda rewanî, diyar bike.**

4- **Çima, divê her civak di qada çandî de azadiya xwe biparêze?**

Wane 2

ÇAND Û JIYANA CIVAKÎ

Civakbûn, berhemeke çandî ye. Dema ku mirov çanda xwe diafirîne, di heman demê de pêkhateyeke nû ya ku jê re **civakbûn** tê gotin, pêş dixe.

Xwezaya civakî (xwezaya duyem), cîhana afirîner a çandê ye. Tiştên ku mirovan di nava xwezayê de afirandine, weke xwezaya duyem tê pejirandin.

Hin lêkolînvan, civakê weke çandeke mirovahiyê didin nasîn, hin jî çandê weke berhemeke civakbûnê dipejirînin. Lê em dizanin ku bêyî civakbûn, çandbûn çênabe. Ji ber tiştên ku mirov wan diguherîne, diafirîne û berheman derdixe holê 'tevî xwezayê' hebûnekê pêk tîne, weke hebûneke civakî, hebûna xwe bi ewle dike. Ji ber vê yekê, şert û mercê yekem di aliyê çandbûnê de civakbûn e. Bêyî ku civakbûn were avakirin, mirovbûn pêk nayê. Lê belê ji ber ku civakbûn bi xwe jî bi sergihayî afirîneke mirovan e, mirov dikare ji wê re jî bêje çanda mirovan.



Her ku di çalakiya civakbûna mirovan de bi awayekî kûr tê jiyankirin û bi hêza mejî û hişmendiya xwe li ser rûyê erdê qasî mirov bêje, ji tunebûnê dest pê dike ku tiştekî weke wê tune ye, berhemên bi vî awayî yên bingehîn û xweşik jî çêdike. Sedema vê, pêwîstiyên mirovan û hebûna wan a civakî pêş dixe.

Ji ber ku, civakbûn çalakiyeke mirovan a bi zanebûn e. Tiştê ku mirov pêk tîne, her ku civakbûn çêdibe, li gorî pêdiviyên çêkera civakî derdikeve holê. Civakbûn hem pêdiviyên me pêşwazî dike û hem jî pêdiviyên nû diafirîne. Her ku civakbûn pêş ketiye, pêşwazîkirina pêdiviyan derdikeve holê û ji bo çareseriya pirsgirêkan a pêşketina afirîneriyê, bûye sedem ku mirovahî tiştên balkêş bike. Di vê wateyê de bi çandbûnê re mirov hemû heyînên di xwezayê de weke; av, kevir, ax, hewa û çavkaniyên sererd û binerd ên bi jiyana xwe re derbas dike. Weke ji pêdiviyê re bibe bersiv, digire dest û nirxekî dide tiştan.

Mirov Hebûneke Çandî Ye

Ji bo ku mirov karibe li ser rûyê erdê bijî, pêdiviyên wan ên bingehîn çi ne? Weke ajoyên bingehîn ên mirov; birçîbûn, parastin û ajoyên zayendî hene. Jiyana ku xwe dispêre ajoyan, jiyana herî hêsan e. **Mînak**: Lawir wiha jiyan dikin. Lê, mirov nikare wiha bijî. Ji ber vê yekê, pêwîst e mirov çandê biafirîne. Bi taybetî, ajoya birçîbûn û parastinê, aliyê herî lawaz ê mirovan jî rave dike. Bêyî ku ev pêdiviyên biyolojîk werin pêşwazîkirin, mirov nikare bijî.

Qasî ku hatiye çespandin di aliyê biyolojîk de mirov zindiyê herî lawaz û herî bêhêz e, ku li ser erdnîgariya cîhanê dijî.

Divê ev lawazî, bê derbaskirin û zindiyê ku jê re mirov tê gotin karibe bijî. Ajoya mirov, wî fêr dike û rê nîşan dide. Ajoya mirovan, ji lawiran cudatir e.

Dema ku ev cudahî nayê fêmkirin, çi dibe? Wê demê rastiya koledariyê ya ku kapîtalîzmê afirandiye, derdikeve holê. Di wateyekê de mirovên ku bi ajoyan qezenc dikin, dibe ku wan jî winda bikin. Di vê wateyê de têkoşîna ku mirov ji bo karibe pêdiviyên biyolojîk pêşwazî bike, divê têkoşînê mirovbûnê bide. Weke hebûnekê tenê kariye bi vê karîgeriyê, xwe veguherîne. Ev têkoşîna mirov û tiştên ku vê têkoşînê afirandine, diyardeyên yekem ên çandbûnê ne.

Taybetmendiya ku tiştên heyberî yên di xwezayê de vediguherîne û li gorî pêdiviyên xwe bi rêk û pêk dike û tiştên nû diafirîne, tenê di mirovan de heye.

Mînak: Li xwezayê, her tim dar û ber hene. Lê ji daran mal û xanî çêkirin. Tu zindî, nikare weke mirovan tiştan çêke. Tiştekî wiha li xwezayê pêk nehatiye. Ji ber vê yekê, ji tiştên ku mirov wan çêdikin re **çand** tê gotin.

Li ser rûyê erdê kevir heye, lê xaniyên ji keviran tune ne; Mih û bizin hene, lê mast tune ye; hirî heye, lê cil û berg tune ne; deng heye, lê muzîk tune ye; xweşikbûn heye, lê peyker û wêne tune ne. Mirov, van hemûyan çêdike.



Çand, afirînekên ku di encama van hemû pêvajoyan de çalakiya mirov a ku ji van encaman re bûye sedem e. Eger ne wiha be em nikarin mirov bi tena serê xwe weke diyardeyeke biyolojîk bidin nasîn. Ji ber ku çêkera me ya biyolojîk ji lawiran ne cudatir e. Mirov jî, ji sazûmaniyên têkilhev(kompleks) ên ku jê re şane, tevn, lebat û sîstem tê gotin pêk hatiye. Ev çêkerên biyolojîk, her çi qas ji aliyê rêkûpêkbûnê ve cuda bin jî, taybetmendiyên hevbeş ên hemû zindiyan in.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Çima, bêyî civakbûnê çandbûn çênabe?**
2- **Çima mirov, nirx dide heyînên di xwezayê de?**
3- **Gelo di navbera çêkera mirov a biyolojîk û lawiran de cudahî heye yan na, çima?**
4- **Valahiyên li jêr, bi peyvên guncav dagire.**
   - Xwezaya civakî (xwezaya duyem), cîhana afirîner a .... ye.
   - Civakbûn hem pêdiviyên me pêşwazî dike û hem jî ………… diafirîne.
   - Jiyana ku xwe dispêre ajoyan, jiyana herî ……… e.
   - Qasî ku hatiye çespandin di aliyê biyolojîk de mirov zindiyê herî ……… û ……... e.
   - Ajoya mirovan ji lawiran ………… e.
   - Tiştên ku mirov wan çêdike, em jê re dibêjin ……….

Wane 3

NIRXÊN ÇANDÎ YÊN BINGEHÎN ÊN MIROVAHIYÊ

Xaleke giriîng ji diyardeya çandî, afirandina **nirxên yekem** ên çandî ne.



ÇANDA NIHA



ÇANDA DESTPÊKÊ

Berhemên mirovahiyê yên bingehîn hebûna me ye û awayekî didin civakbûna me.

Ev berhem, bi demê re bûne gerdûnî. Dema ku bûne gerdûnî, bi misogerî her deverên ku diçin, hin tiştan tevlî çêkera xwe dikin. Ji ber ku tiştên tevlî çêkera xwe dikin jî, berhemeke çandî bi şert û merc a ku cewhera xwe biparêze, dikare teşeyeke nû bide xwe.

Mînak: Dema ku tê gotin gund, gelo çanda kê ye?

Mirov nikare bêje: Li ku derê gund hebin, gund; çanda wan e. Dema tê gotin çandinî, çanda kê ye?

Mirov nikare bêje: Li ku derê çandinî tê kirin, çandinî; çanda wan e.

Çandinî, di destpêkê de li ku derê derketibe, ew çanda wan e. Lê belê, ji her devera ku çûyê, dibe çanda mirovên li wir jî. Mirov dikare ji vê re zimanê Aryen û çanda Aryen a ku li Mezopotamyayê ji aliyê kurdan ve bi awayekî derbasbûna jiyana niştecihî hatiye afirandin, bike mînak. Mirov gelek tiştên xwe yên destpêkê yên weke çandina tovên yekem, çêkirina cil û bergên destpêkê, cara yekem kedîkirina lawiran, amûrên destpêkê, lêkirina xaniyên destpêkê û hwd. weke mînak nîşan bide. Tiştên ku îro jî di jiyana me ya civakî de bingeh in, çavkaniya xwe ji van destpêkan girtine. Destkeftiyên dîrokî yên li Kurdistanê, ev piştrast kirine. Bi riya çanda Til Xelefê çanda neolîtîk a ku sazîbûna xwe pêk aniye û li hemû cîhanê belav bûye. Di wateyekê de rista çavkaniya bingehîn a ku lîstiye, erdnîgariya ku ev çand destpêkê lê hatiye afirandin e.



Rista Erdnîgariyê di Çêbûna Çandê de

Cudabûnên çandî, di encama têkiliya mirovan a bi xwezayê re derdikeve holê. Mirov, ji aliyê biyolojiyê ve weke hev in. Rêbazên ji bo pêşwazîkirina ajoyên bingehîn, di hemû mirovan de kêm zêde weke hev in. Lê cudahiyên ku di vî warî de hene, bi qasî ku neyên dîtin, kêm in. Hemû mirov dihizirin, diaxivin û ji bo ku jiyana xwe bidomînin, civakbûnê pêş dixin û bi vî awayî hebûna xwe dixin bin ewlehiyê. Lê belê tevî vê yekê, em dizanin ku di nava jiyanê de gelek cudahî jî pêş ketine.

Mînak: Gelek pergalên hizirîn, ziman, çand û nasnameyê hene. Ger em niha karibin behsa mirovahiyeke giştî û gelek tiştên weke hev bikin, ev cudahî çawa derdikevin holê? Ev rewş, girêdayî erdnîgariya ku mirov li ser jiyan dikin e. Rewşeke

taybet a erdnîgariyê ya ji bo çandê heye. Erdnîgarî, teşeyekê dide çandê. Çandek li ku derê, di kîjan şert û mercan de û li ser kîjan bingehan teşe girtibe, li ser wê pêş dikeve. Mirov, hemû berhemên ku bi dest dixe, ji xwezayê peyda dike.

Derfetên ku erdnîgarî dide mirov, li ser hizir û ziman bandorê dike. Ev jî, li ser cudahiya di navbera mirovan de risteke bingehîn dilîze.

Cudahiya erdnîgariyê, ji mirovên ku li her qadê girêdayî şert û mercên avhewayê jiyan dikin re, derfetê dide yan jî zorê derdixe.

Mînak: Li Hîndistanê gundek ji heriyê ava kirin, zêde ne karekî guncav e. Ango dema ku li Hîndistanê xanî tên lêkirin, gund tên avakirin, lê kerpîçê ji axê nayên bikaranîn. Ji ber ku li Hîndistanê avhewaya şilîdar heye û her tim baran dibare. Wê demê, ji bo ku beramberî baranê bergirî(tedbîr) bên girtin, pêwîst e beriya her tiştî mirov heybereke ku ji baranê bandor nabe, peyda bike. Erdnîgariya Mezopotamyayê germ e, di heman demê de erdnîgariyeke sar e. Wê demê pêwîst e mirov heybereke ku wan li dijî germ û sermayê biparêze, nas bike.

Mînak: Erdnîgariya ku derya lê heye, civakên ku li wir jiyan dikin; bi çanda jiyana xwe ve ji çanda mirovên ku li çolê jiyan dikin, cuda ne. Çandbûn; tê wateya pêşwazîkirina pêdiviyên civakê. Ev, zagoneke bingehîn a civakê ye û her tim wê wisa be. Di çêbûna cudahiyên çandî de, têkiliya civak û xwezayê diyarker e. Di çêbûna vê dewlemendiya çandî de

risteke girîng a din, ew e mezinbûna çarçoveya çanda heyberî û rewanî ye.

Hizirên ku di nava çêkera civakî de pêk tên, kevneşopî jî di çêbûna dewlemendiya çandî de risteke girîng dilîze. Lê belê bingeha dewlemendiya çandî, bi têkiliya civak û xwezayê re bêhtir encamgir e.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Çend mînakan li ser nirxên yekem ên mirovahiyê, diyar bike.**

2- **Li gorî nêrîna te, çima berhemên mirovahiyê yên bingehîn bi demê re bûne gerdûnî?**

3- **Çima cudahiyên çandî di navbera mirovan de derdikeve holê?**

4- **Valahiyên li jêr, dagire.**

- Mirov ji aliyê biyolojiyê ve ……… in.
- Mirov hemû berhemên ku bi dest dixe ji ……… peyda dike.
- Di çêbûna cudahiyên çandî de têkiliya civak û ……. diyarker e.
- Bi riya çanda ……..... çanda neolîtîkê ya sazîbûna xwe pêk aniye, li hemû cîhanê belav bûye.

Wane 4

DI ÇANDÊ DE TAYBETMENDIYA GERDÛNÎBÛN Û HERÊMÎBÛNÊ

Di çandê de **gerdûnîbûn**, tê wateya ku ji hemû mirovahiyê re bi sûd e. Ger nirxên çandî bibin cîhanî, ev nirx bi hêz in. Nirxên ku aliyên wan ên komînal bi hêz in, nirxên gerdûnî ne. Hin nirx hene ku li her deverê pêwîstî bi wan heye.

Mînak: Çêkirina xwarin, muzîk û hwd.

Ev tişt, di her civakê de derbasdar û pêwîst in. Lê belê her nirxê gerdûnî, herêmîbûnê jî di nava xwe de dihewîne. Muzîk gerdûnî ye, lê belê muzîka her gelî bi xwe jî heye. Her tiştê herêmî, neçar e ku gerdûnî be. Lê belê her nirxê ku gerdûnî ye, di heman demê de bi misogerî divê herêmî be jî. Çandên ku nirxên wan ên gerdûnî pir in, çandên bihêz in. Ev çand; xwezayî û xweser in. Di afirandina tiştên destpêkê de xwedî bandor in**.**

ÇANDA TIL XELEF

Mînak: Çanda kurdan, çandeke wiha ye. Ji ber ku çanda kurdan afirandiye, zimanê û çanda Aryen ji bo hemû mirovan, bûye çavkanî û dayîka afirîner.

Qezençkirina Çandê

Civakbûn dema ku çandê diafirîne, wê fêrî mirovên xwe dike. Rêbazên fêrbûnê hene. Mirovên ku di nava civakbûnê de jiyan dikin, bi rêbazên weke; rêgezên sincî, perwerde, kevneşopiyên civakî, seza û xelatkirinan fêrî çanda civakbûnê dibin. Bi çandbûna ku jidayîkbûnê dest pê dike, bi tunebûna wê çandê re bi dawî dibe.

Bi destxistina çandê de, du têgeh derdikevin pêşberî me. Ev, çandbûn û civakbûn in.

Bi çandbûnê re mirov li gorî xwestek û pêwîstiyên civakê bandor dibe û tê guhartin. Çawa ku temenê xwendinê tune ye, temenê tevlîbûna pêvajoya bi çandbûnê re jî, tune ye.

Civakbûn; fêrbûna nirx û rêgezên civaka ku mirov tê de dijî ye. Mirov, taybetmendiyên civaka xwe ji malbat, xizim û hevalên xwe, dibistan, kolan û ji cihê kar fêr dibe. Ji vê pêvajoya ku seranserê jiyanê berdewam dike re civakbûn tê gotin.

Tevgerkirina mirov a li gorî rêgezên trafîkê, di nava tirêmbêlan de cihê xwe nas dike. Di bingeh de têgeheke ku jê re bêçandbûn tê gotin tune ye, dibe ku ev mirov çandê nas bike, yan jî nas neke.

Di her dem û cihî de her endamê civakê ji nû ve çandekê nafirîne. Çand, nirxên mayînde rave dike. Ji ber van taybetmendiyan, dema ku mirov dijî, fêrî vê çandê dibe û li gorî pêdiviyên wê, hin tiştan li ser zêde dike.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Gerdûnîbûn, çandbûn û civakbûnê pênase bike.

2- Kengî çandbûna ku jidayîkbûnê dest pê dike, bi dawî dibe?

3- Bi kîjan rêbazên fêrbûnê, civakbûna ku çandê diafirîne, wê fêrî mirovên xwe dike?

4- Çanda ku kurdan di dîrokê de afirandiye, çi ye?

5- Hevokên li jêr, bi peyvên guncav sergihayî bike.

- Nirxên ku aliyên wan ên komînal bi ………….. in, nirxên gerdûnî ne.
- Çand, nirxên …..…….. rave dike.
- Bi pêvajoya civakbûnê re mirov çanda civaka ku di nav de dijî, ……….....

Wane 5

BELAVBÛNA ÇANDÊ

Nirxên çandî, di civakê de bi riya perwerdeyê, ji nifşekî ta nifşekî din tê **ragihandin**. Karê ragihandina çandê bi xwe jî; çandek e.

Ev, ji bo mayîndebûna çandê jî, hêmanek e. Domdariya çandê, bi awayekî rast pêkanîna ragihandina çandê pêwîst dike.

Belavbûna hêmanên çanda heyberî û rewanî ya çandekê di nava çandeke din de weke belavbûna çandê tê pênasekirin.

Veguhartin, diyardeyeke civakî ye. Berhemên ku qadên bingehîn ên çandê rave dikin, her tim vediguherin. Lê belê ya ku pêwîst e bê zanîn, çi; li ku derê û çawa vediguhere?

Mînak: Çanda jiyana niştecihî, awayên gund û bajaran nayên guhartin. Lê dikare mezinahiya avahiyên gund û bajaran bê guhartin. Veguhartina çandî, neçariyek e. Veguhartina mirov an jî komekê, ne veguhertina çandî ye.

Mînak: Veguhartina komeke ji komên ku li Rojavayê Kurdistanê jiyan dikin, nayê wê wateyê ku çanda kurdan hatiye

guhartin. Ger li vir guhartineke ku civakbûnê rave dike, pêk were û ev bibe malê hemû kurdan; ev dibe veguhartina çandî.

Hewldana pêşwazîkirina pêdiviyên mirov, bingeha veguhartina çandî ye. Çand, diyardeyeke ku her tim bi mirovan re tê guhertin. Lê belê di çandê de her tişt, her tim nayê guhartin.

Du çandên bingehîn hene: A yekem çanda hilberîn û amûrên hilberînê û ya din jî çanda rewanî ye. Ango qalibên hişmendiyê, faktorên weke hizir û sinc in.

Bê hevsengiya ku di navbera hêmanên heyberî û rewanî yên çandî de tên jiyankirin, sedemeke veguhertina çandî ye. Ev, zagoneke civakî ye.

Di teşe û cewher de veguhartina çanda heyberî û rewanî, dibe sedema bê hevsengiyekê, mirovahî dixwaze vê bi awayekî derbas bike. Ev xwestek, dibe sedema veguhertina çandê.

Danûstandina çandê, bi xwe re veguhartina çandî jî tîne. Helbet, çand di her nifşî de hin guhartinan derbas dike; ji ber ku her nifş bi ezmûnên xwe hin tiştên ku ji berê de mane, tavêje.

Tiştên ku bi xwe vedîtine, tevlî çandê dike û bi vê yekê, civak pêş dikeve.

Di asta hozên seretayî de jî hebûna civakekê di çanda wê de tu carî guhartinek çênabe. Ev veguhartin, bêhtir di encama têkiliyên çandên cuda de çêdibin.

Veguhertina çandê bi du awayan çêdibe: Ji van, yek bi awayekî serbest, a din jî bi veguhartina çandê ya bi darê zorê ye. Veguhartina çandê ya serbest, di têkiliyên civakên ku danûstandinên ji aliyê çandê ji ber xwe ve pêk tînin e. Veguhartina bi darê zorê jî, yek ji komên civakî yên cuda ya ku xwedî çandeke cuda ye, hewl dide ku çanda xwe bi darê zorê bi çanda din, bide pejirandin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Belavbûna çandê, pênase bike.**

2- **Nirxên çandî, di civakê de bi kîjan rêbazî ji nifşekî ta nifşekî din tê ragihandin?**

3- **Çend sedemên veguhartina çandê, diyar bike.**

4- **Veguhartina çandê, bi kîjan awayan çêdibe?**

5- **Hevokên li jêr, bi peyvên guncav sergihayî bike.**

- Veguhartin, diyardeyeke …….......... ye.
- Berhemên ku qadên bingehîn ên çandê .... her tim vediguherin.
- Veguhartina mirov an jî komekê ne .... çandî ye.

BEŞA DUYEM

QADÊN BINGEHÎN ÊN AFIRANDINÊN ÇANDÊ

- Qada Hizir û Ziman
- Qada Aborî û Hunerê
- Qada Polîtîkayê
- Qada Zanist Û Teknîk-Teknolojiyê

Wane 1

QADA HIZIR Û ZIMAN

Qada Hizirê

Hizir: Hêmaneke çanda rewanî ya sereke ye. Di nava qada ziman û hizirê de, qada ku bi awayekî hêsan bi cih dibe.

Ziman û hizir, bi awayekî herî berfireh di nava xwe de qadên cuda ne. Dibe ku di hizira mirovekî de hin hêmanên girêdayî qadên din jî hebin.

Mirov, hemû afirîneriya xwe bi riya hizirînê pêk tîne. Her tiştê ku mirov pêk tîne, bi awayekî ji hizira wî ye. Dibe ku yek an jî komek, hemû afirîneriya hişmendiya xwe nikaribe bide nasîn, lê ew kom di hişmendiya xwe de cihê hemû raboriya dîrokî ya ku li ser bandor kiriye, hildigire.

Çanda Bîrdoziyê: Bîrdozî, yekîtiya hizirên ku berekî dide reftarên komekê, çînekê yan jî civakekê û polîtîkaya wê diyar dike.

Qada Zimên

Ziman, hêmaneke rewanî ya çandê ye. Mirov hest, hizir û pêdiviyên xwe bi ziman rave dike. Ji ber vê yekê, bikaranîna zimên di pêşketina civakan de risteke girîng dilîze.

Her wiha, ziman weke pêwîstiyeke civakê derketiye hole, rojane karîgerî bûye û xwe bi rêxistin kiriye.

Ziman, di destpêkê de bi riya dest ta deng pêş ketiye.

Her civak an jî gel; di seranserî dîroka xwe de li gorî erdnîgarî û avhewaya ku tê de dijî, zimanek pêş xistiye.

Ev xweseriya di civakên girtî de weke (klan, hoz, êl), bi awayekî balkêş xwe nîşan dide.

Ev cudahiya ku heye, ji rêzbûna peyvan bigire ta awayê xîtabê ye. Ziman ne tenê amûra hişmendiya civakê ye, di heman demê de rista avakirinê jî dilîze. Ziman, ji hêmayên bingehîn ên ku civakê ava dikin.

Nivîsa zimanê Aryenan

Civak bi hêzbûn û bê hêzbûna xwe, di hizir û ziman de dijî. Gel çi qasî zimanê xwe biparêze û pêş bixe, ew qasî dikare hebûna xwe bi ewle bike û bidomîne. Her gel, domandina hebûna civakbûna xwe, deyndarê kar û bikêrhatina zimanê xwe ye.

Hêmayên çandî yên ziman, ji nifşekî vediguhêzin nifşekî din.

Mirovên ku fêrî zimanê xwe bûne, nivîsandin jî pêk anîne. Nivîsandina ziman a ku bi riya sembolan rave kirine, çandê ji nifşekî ta nifşekî din radigihîne.

Her gel, bi navê zimanê xwe tê naskirin. Weke; kurd bi kurdî û ereb bi erebî. Ji ber vê yekê, hêzên desthilat ên ku kurdan mandêl dikin, zimanê wan jî mandêl dikin. Ziman, pireke di navbera dema borî û îro de ye.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Qadên bingehîn ên afirandinên çandê, çi ne?

2- Çanda bîrdoziyê, pênase bike.

3- Rista zimên a di civakê de, çi ye?

4- Valahiyên di hevokên li jêr de dagire.

- Hizir, hêmaneke çanda .... ya sereke ye.
- Mirov, hemû afirîneriyên xwe bi riya ……. pêk tîne.
- Ziman, destpêkê bi riya ……… ta ……. pêş ketiye.
- Mirovên ku fêrî zimanê xwe bûne, nivîsandin jî ….
- Gelê ku zimanê xwe biparêze û pêş bixe, dikare …… bi ewle bike û bidomîne.

Wane 2

QADA ABORÎ Û HUNERÊ

Qada Aborî

Aborî, ji aliyê afirandina çandê ve bi serê xwe qadek e.

Ev, qadeke ku bi tîmarbûnê, bi rastiya hilberînê ya mirovahiyê re têkildar e.

Dema ku mirov kar û xebata aborî bi rê ve dibe, pêdivî derdikevin holê û ji bo ku van pêdiviyan pêşwazî bike, amûrên ku afirandine, çanda vê qadê rave dikin. Ev, qadeke fireh û girîng e.

Qada ku bi lez tê guhartin jî, ev qad e. Rista ku amûrên di jiyana civakî de dilîze, pir hatiye dahûrandin.

Hişmendiya mirov, li vê qadê, xwe pir kêrhatî dike. Mirov dikare bêje ku awayê civakbûnê, bi awayê çanda aborî teşe digire. Qada aboriyê, çanda jiyana heyberî ye.

Awayên cuda yên aboriyê hene. W eke; çandinî, lawirvanî û pîşesazî.

Ev qada sereke ya kedê ye. Çanda amûrên hilberînê jî heye. Weke tê zanîn peyva **eko-nomos** di zimanê yewnanî de tê wateya zagona malbatê. Cara yekem, malbatên ku li ser çandiniyê jiyana xwe berdewam dikin, li derdora jinê pêş dikevin. Her wiha, pir kêm be jî, di destpêkê de qûtên ku dikarin di demeke dirêj de xerab nebin, bi derfeta ambarkirina qûtan re aborî dest pê dike.

Lê belê, ev kar ne ji bo bazirganî û bazarê ye, aboriyeke ji bo malbatê ye.

Civaka dewletparêz, hewl dide ku herî zêde qada aborî bi dest bixe û berhemên ku ji vê qadê derdikevin holê desteser bike û li ser civakê serweriya xwe ava bike.

Ji ber ku bi çandbûna qada aboriyê re pêdiviyên xwe pêşwazî dike.

Mezinbûna çanda aborî, dibe sedem ku jiyana civakî di asteke girîng de bi hêsanî were jiyankirin.

Li gorî şêwaza birêvebirina civak û çandan a pergalan, bikaranîna vê qadê di veguherîna çandê de her tim bûye egereke girîng.

Baş tê zanîn ku kapîtalîzm, vê çandê weke astengekê li pêşiya veguhertina civakê û ji bo desthilatdariya xwe, çi qas bi kar aniye û bi kar tîne.

Bi kurtasî, yên ku dixwazin çandê biguherin û naxwazin biguherin jî, berê xwe dane vê qada afirîner û derfetên wê.

Qada Hunerê

Huner: Bi riya hunera xweşikbûnê re ravekirina hest û hizran derdikeve holê.

Bi raveya hest û hiziran, civaka xweza û mirov ji nû ve tên şîrovekirin û watekirin.

Hunera ku bi riyên, weke; muzîk, helbest, wêne û sînemayê tê ravekirin, çalakiyeke afirîner e.

Huner, hem taybetmendiyeke gerdûnî û hem jî kesayetî ye. Bi riya huner û hunermendan, berhemên rewanî yên nû tevlî

dikin. Huner, bi riya dana derve ya hizira baweriya yekem dest pê kiriye. Ji ber vê yekê, karekî sincî ye.

Di serdemekê de ziman, karîgeriya xwe bi riya hêmanan pêk aniye. Lê, bi riya hunerê mirov teşe dide hest û hizirên xwe. Mirov ji bo ku bijî, di nava xwezayê de gelek kar û xebatan bi rê ve dibin. Lê huner weke zagoneke xwezayî ye.

Mînak: Bûyîna awaza deng, bûyîna wêneyek, bûyîna şanoyeke reftar û çalakiyên ku ji aliyê mirovan ve tên kirin, ji ber xwe ve nabin. Ji ber vê yekê jî, zimanekî hunerî heye. Jixwe mirovên destpêkê, bi dengên balkêş kêfxweşiya xwe diyar kirine. Mirov dikare bêje, huner beriya zimanê axaftinê, di navbera mirovan de weke çanda danûstandin û lihevkirinê hatiye bikaranîn.

Hunermend Aram Dîkran

Mirov; bi riya hunerê, kêfxweşiyên xwe yên jiyanî, xembariya xwe, êşa xwe diyar kirine. Huner, hem awayekî dide hest û hiziran, hem jî tiştên ku mirov dijî, dide derve.

Berhemên hunerî tevî ku di nava civakekê de derdikevin holê, dikarin ji hemû cîhan û civakan re bibin destkeftî.

Huner, bi mirov dest pê dike, li ser hemû çandên ku mirov di nav de dijî bandor dibe, digihêje asta cihanî. Berhemên hunerî yên ku tên afirandin, bi riya çandbûnê li hemû cîhanê tên belavkirin.

Lê belê, dema ku berhemên çandî yên welatekî tên girtin, pêwîst e em di heman demê de afirîneriya xwe ya çandî jî, bi kar bînin. Hunermend, mirovê/a ku bûyerên di jiyana xwe de çavdêrî kiriye, an jî li pirsgirêkeke wiha hest û hizirên xwe jî zêde kirine. Di vê wateyê de hunermend rewşenbîrek e, ku rastiya civakî nîşan dide û civakê bi pêş ve dibe. Ji ber vê yekê, bi riya hunerê mirov awayekî dide hest û hizirên xwe.

Weke tê zanîn, ji bo ku çand karibe nirxên komînal rave bike, pêwîst e kesayeta civakê, azadî û wekheviyê bingeh bigire. Tevî van taybetmendiyan, bi hemû afirîneriya mirov re çêdibin.

Qada hunerî, qadeke ku hem ji qada çanda heyberî hem jî qada çanda rewanî ya ku civak xwe xwedî dike. Her wiha, qada hunerî neçar e bibe qadeke civakî. Ev, taybetmendiya herî bingehîn a hunerê ye.

Gelek qadên hunerî hene. Her çand, xweseriya xwe bi awayê herî balkêş, di qada hunerî de dide der.

Taybetmendiyeke hunerê jî, her tiştê ku di qada jiyanê de weke mijara xwe dibîne û wiha dinirxîne. Ji ber vê yekê, li gelek deveran çand û huner hema hema di heman wateyê de tên bikaranîn. Girîngiya ji hunerê re, girîngiya ji mirov re ye.

Em jî çand û hunerê li gel hev bi kar tînin. Ev, bi wateya ku em didin hunerê re têkildar e.

Di wateya afirandina nasnameya çandê de gelek rist û berpirsiyariyên hunermendan hene. Di her tiştê ku mirov diafirîne û ji xwe tevlî xwezayê dike de aliyekî hunerî heye. Ji

bo ku mirov fêr bibe; ka kê, kîjan civakê û çi tevlî xwezayê kiriye, huner pêwîst e.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Çend awayên cuda yên aboriyê, diyar bike.**

2- **Çima civaka dewletparêz, hewl dide ku qada aboriyê bi dest bixe ?**

3- **Huner, di civakê de bi riya çi tê ravekirin?**

4- **Çima huner, karekî sincî ye?**

5- **Çawa çand dikare di civakê de nirxên komînal rave bike?**

6- **Navê çend hunermendên navdar ên li Rojava binivîse.**

Wane 3

QADA POLÎTÎKAYÊ

Polîtîka, peyveke yewnanî ye û tê wateya rêveberiya bajêr. Di wateya civaka demokratîk de jî qada çalakiyên hevbeş e.

Em dikarin ji vê re bêjin zanista rêbazan, an jî danasîna herî kurt; qada ku hişmendî lê çalakiyan vediguhere.

Civak tê gel hev, biryarên jiyanî yên der barê xwe de digire û xebata veguherîna çalakiya wan biryaran bi rê ve dibe, ango polîtîkayê bi kar tîne.

Polîtîka; bi azadî, wekhevî û demokrasiyê re têkildar e.

Polîtîka, afirînerî û huner e. Dema ku bi karîgerî watedar nebe, polîtîka nabe.

Civak, weke sinc diyardeyeke polîtîk û xwezayî ye.

Eger mirov bipejirîne ku sinc karê jiyanê yê herî baş bi cih aniye, wê demê karê polîtîkayê jî herî baş pêk aniye.

Polîtîka, di bingeha xwe de tê wateya çalakiya civakê ya sincî.

Ji bo ku di her şert û mercî de jiyana xwe bidomîne, çalakiya azadî, wekhevî û demokrasiyê pêk tîne.

Rista polîtîkayê; civaka sincî ya ku heya roja me hatiye; pêşxistin, azadî, wekhevî û demokratîkirina wê ye.

Her çîn, bajar, gel, hoz û komên olî ku nikarin polîtîkayê bikin, an jî riya polîtîka kirina wê tê astengkirin, tê wateya ku hêza gotin û vîna wê derbeyeke mezin xwariye.

Rista bingehîn a sinc, berdewamkirina hêza civakê û bûyîna xwedî zagonên ku li ser piyan mane û pêkanîna wê ye.

Rêveberiya Xweseriya Demokratîk

Civaka ku zagona hebûna xwe ji dest dide û hêza pêkanîna van zagonan winda dike, tê wateya ku veguheriye û bûye weke jiyankirina lawiran. Di vê rewşê de keda civakê, wê were xwarin, rista polîtîkayê jî di bingeh de peydakirina rêgezên sincî yên ji bo civakê ye.

Di encamê de polîtîkaya civakî xwe bi rê ve dibe, karê civakê çareser dike, civakê tîne warekî zindî û weke kêrhatinekê ji civakê re çêdike.

Civaka bêpolîtîka, weke mirîşkeke serjêkirî ye. Riya herî bi bandor a civakeke bêhêz, ji bo hebûna xwe ya cewherî û ji bo pêdiviyên wê yên heyberî û rewanî, weke hebûnekê ew neçarî bê biryarî, an jî bê polîtîkayê hiştin e.

Di seranserê dîrokê de dewlet, desthilatdarî û têkiliyên wê, li cihê sincê civakê; maf û li cihê polîtîkaya civakê; rêvebirina dewletê bi cih kirine.

Civak, ji du stratejiyên(sinc û polîtîka) bingehîn pêk tê. Ev stratejiyên ku hebûna civakê li ser piyan hiştin, sinc û polîtîka ye, li cihê wê desthilatdariya maf û rêvebirinê bi cih kirin.

Tê zanîn, ku hebûna sermayedariyê, şêwazên dagirkeriyê dimeşîne. Ji ber vê yekê, bêyî hebûna van her du erkan, nikare hebe.

Hemû rûpelên dîroka şaristaniyê ya ku di 5 hezar sal de bi hewldana şkandina hêza sinc û polîtîkaya civakê, her wiha li cihê wê bicihkirina maf û rêvebirina wê ve dagirtî ye.

Dîroka şaristaniyê bi sedemên xwe yên rast wiha ye û bi awayekî rast nivîsandina wê, tenê bi van sedeman dikare wateyekê rave bike.

Di bingeha hemû şerên dîrokî yên civakê de ev rastî heye. Gelo civak wê li gorî sinc û polîtîkaya xwe bijî, yan jî wê li gorî maf û birêvebirina yekdestiyên din û har bûyî, weke keriyekî pez bijî?

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Polîtîkayê, pênase bike.**

2- **Civak, li ser kîjan stratejiyên bingehîn pêk tê?**

3- **Rista polîtîkayê ya di civakê de diyar bike.**

4- **Li şûna sinc û polîtîkaya civakê, amûrên ku desthilatdar û dewletê pêk anîne çi ne?**

Wane 4

QADA ZANIST Û TEKNÎK-TEKNOLOJIYÊ

Zanist, bi qasî dîroka mirovahiyê kevn e. Têkiliyên di navbera mirovên yekem ên ku dar girtine destên xwe, darên fêkiyan pê hejandine û fêkiyên ji daran xistine xwarê jî, zanist bi xwe ye.

Mirov, dikare heman tiştî ji bo çêkirina amûran jî bêje. Ev reftarên mirovahiyê, ji destpêkê ve hene.

Şoreşa Neolîtîkê jî, weke şoreşeke teknîkî ya zanistî tê pejirandin. Zanist, bi pirsa yekem a ku mirov ji bo derdora xwe dike, dest pê dike û ta roja îro tê. Ev qad, ji bo ku mirov lewaziyên xwe yên fîzîkî derbas bike, hewldana mirov a ji bo çêkirina amûrekê ku di navbera xwe û xwezayê de bi kar bîne ye.

Zanist, çavkaniyên hêzê yên xwezayê xistine xizmeta mirovahiyê. Mirovên yekem ên ku dar weke amûr bi kar anîne, di bingeh de xwe gihandine zanistê.

Dema ku zagoneke fîzîkî tê bikaranîn û ji xizmetê re tê amadekirin, bendekeyekê nîşan dide ku zanist hatiye kirin.

Civak, ji avabûna xwe û vir ve bi diyardeya zanistê re di nava têkilî û nakokiyê de ye. Her ku nakokiyê çareser dike,

têkiliya heye vediguhere zanistê. Ev jî diyar dike ku di zanistê de diyardeyeke domdar heye.

Pêşketinên zanistî, encamên pêşketinên civakî ne, ango ne berhemên kesî ne. Di encamê de bûyîna zanistê ya ku di nava pêvajoya dîrokî de pêş dikeve, derketiye holê.

Zanistbûn, tê wateya hêzdar bûnê. Ya rastir, zanist; tê wateya ronakbûnê û ronakbûn jî; tê wateya karê rastkirinê, karê rastkirinê yê serkeftî, tê wateya hilberînên zêde.

Pêwîst e, baş were zanîn ku şaristaniya kapîtalîst, nabe sedema pêşketina zanistê. Di asteke herî li pêş de ji bo sînorkirina wê, rist dilîze. Nakokiyên di nava wê de heye, li ber pêşketina hemû hêza zanistê dibin asteng. Bi taybetî, li pêşberî pêşketina zanista civakî, rejîma herî paşverû ye.

Lê belê, tevî zanistê yên ku di nava teşeyên civakî de ta niha pêk hatine, pergala kapîtalist a ku herî zêde avaniya xwe ya jêr û jor bi hêz kiriye ye.

Ev taybetmendiya wê jî, di çêbûna serdema kapîtalîzmê de ji rista afirîner a ronakbûnê tê.

Hêza xwe; ji pêşxistina zanistê, gihandina asteke sazîbûna zanistê û ji rêveberina wê digire.

Di vî warî de ev pergala herî pêşketî ye. Ango, sîstema ku herî zêde ji hêza zanistê sûdê werdigire, kapîtalîzm e.

Teknolojî, bi lezeke mezin di pergala kapîtalîst de pêş ketiye. Bi taybetî, teknîkên weke; ragihandin, nukler, veguhestin û hwd. jiyan pir bi hêsan kiriye. Lê belê, ji ber ku teknolojî ji aliyê kapîtalîzmê ve bi tevahî xistine bin xezmeta xwe, teknolojî bûye kurmê mirov.

Amûrên veguhestinê yên pêşketî

Zanist bi xwe, pêşverû ye. Gelek tiştên ku tevlî çanda mirovahiyê kirine, hene. Lê, ji ber têkiliya ku zanist dikeve bin xizmeta desthilatdariyê û bi desthilatdariyê re bûye yek, risteke xerab lîstiye.

Di dîroka mirovahiyê de ev hatiye jiyankirin. Di vê wateyê de di dagirkirina civak û xwezayê de zanist bi desthilatdariyê re bûye yek.

Çavkaniya bingehîn a şer û tundiyê jî, xwe dispêre vê. Li gorî kapîtalîzmê; ji bo sermiyandarî, bihêzkirin û misogerkirina wê; her tişt rewa ye.

Di vê wateyê de dikare asta ku zanistê xwe gihandiyê ye, bi kar bîne û bixe bin xizmeta xwe.

Bi vê hişmendiyê, bombeya atomê li ser sed hezarê mirovan hatiye bikaranîn û bi milyonan mirov kuştine.

Îro, li ser tê nîqaşkirin ku bombeyên nukler û hîdrojenê, metirsiyên herî mezin ên li ser jiyana mirovahiyê ne. Teknîkên bi vî awayî yên ku di bin xizmeta pergala kapîtalîstê de ne, bi xerabkirina hevsengiya xwezayê re dibin sedema pirsgirêkên pir cidî yên ekolojîk.

Ji ceribandinê ta encama bikaranînê; pirsgirêkên pir mezin ên tenduristiyê derdikevin holê, avhewayê diguherîne û hevsengiya cîhanê wêran dike.

Her wiha, dema ku şer û tundî pêş dikevin, di asteke pir girîng de civakbûna civakê tê belavkirin û wêrankirin. Ev hemû, dibin sedema nexweşiyên civakî û giyanî. Encamên ku ev rê li ber vedikin, pir zêde ne. Ev bi hatina warê zanistê ya desthilatdariyê re û bi yekbûna zanist û desthilatdariyê re her wiha, bi pêşketina zanistperestiyê re qat bi qat zêde dibin û pêş dikevin.

Bombeya Atomê



Bombeya Nuklerê

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Qada zanist û ronakbûnê, pênase bike.

2- Zanist kengî û çawa dest pê kiriye?

3- Rista şaristaniya kapîtalist a di zanînê de diyar bike.

4- Çima teknolojî, bi tevahî bûye kurmê mirovan?

BEŞA SÊYEM

SINC ÇI YE?

- **Exlaq, çi ye?**
- **Di nava civakê de hizirandina baweriyê û girêdana wê ya bi exlaq re**
- **Exlaq, wijdanê civakê ye**
- **Di exlaq de azadî**
- **Di exlaq de berpirsiyarî**
- **Têkiliya ol û exlaq**
- **Vegera exlaqê civakî**
- **Aliyên exlaqî yên têkoşînên azadiyê**

Wane 1

SINC ÇI YE?

Yekbûna rêgez, pîvan û nirxên ne nivîskî yên civakî û sazûmankirina têkiliyên mirov ên endamên civakê ku di nava heman civakê de jiyan dikin, jê re **"sinc"** tê gotin.

An jî weke ku hatiye gotin: Jiyana bi rêgez a civakî ku zorê bingeh nagire.

Rêgezên civakî yên ku bi darê zorê hatine avakirin, jê re **"hiqûq"** tê gotin.

Di navbera hiqûq û sinc de cudahiya diyar a bingehîn, ev e.

Peyva sinc; di zimanê kurdî de hoy e û di zimanê erebî de ji peyva xulq tê.

Dema ku sinc tê gotin, destpêkê ya ku divê were têgihîştin; şêwaza ku di encama lihevkirina civakî de bi rêgezên xwezayî hatiye avakirin e.

‘Sinc, riya herî baş a bidestxistina pêwîstiyên bingehîn ên aboriyê ye, ya rastî yên jiyanê ye.

Her wiha, hemû hebûnên civakî; sincî ne û her hebûnên sincî jî; civakî ne.

Mînak: Weke ku aborî sincî ye, ol jî sincî ye. Weke demokrasiya rasterast, polîtîka sinc bi xwe ye. Sinc ji destpêkê ve, ji bo civakê mijareke jiyanî ye.

Karê herî baş çawa tê çêkirin? Li ser vê pirsê hizirîna ku tê pêşxistin, dibe rêgeza sincê ya bingehîn û di hişmendiyê de tê rûniştandin.

Ev rastî, bi demê re dibe kevneşopiyeke xwedî derfet û di bîra civakî de bi cih dibe. Êdî sinc ava dibe.

Der barê sinc de di navbera feylezofan de gelek guftûgo hene. Ta niha pênaseyeke hevpar a ku di navbera xwe de ava bikin, an jî lihev bikin tune ye. Sedema wê jî ew e ku her kes ji aliyê xwe ve, an jî li gorî berjewendiyên xwe nêzîk dibe.

Ji ber vê yekê, sinc li gorî hinekan; şêwaza kesayetiyê ye û li ser bingeha avabûna civakê ya bi têkiliyên derdor û saziyan re weke rêgez nîşan dide. Li gorî hinekan jî, ev têkilî; azadiya aliyên din an asteng dikin, an jî kêm dikin. Lê ya rastî, ew e ku sinc; bi civakbûn, hişmendî û jiyana hevpar re were avakirin.

Rista sinc a di nava civakê de

Mirov û civak, bê sinc nabin. Di nava civakê de sinc, karê çimentoyê-xercê dilîze.

Çawa ku di nava beşên laşê mirov de ji aliyê kar û xebatên wan ve cudabûn heye û ji bo ku her beşa laş bixebite, pêwîstî bi oksîjen, tîmar û xwînê heye û ev jî bi riya rayên xwînê vediguhezin hev; sinc jî di nava civakê de vê ristê dilîze. Her beşa laş ji bo ku karibe bixebite, pêwîst e ji beşên laş ên din pêdiviyên xwe bigire.

Di vê wateyê de sinc dibe xerca civakê.

Çawa ku dema dîwarek tê lêkirin; berek, li ser berekî tê danîn û kerpîç, li ser kerpîçekî tê danîn, her wiha ji bo ku saxlem jî bibe, navbera wan bi xercê tê dagirtin.

Eger sinc nebe, wê mirov weke lawiran bijîn. Her kes bi serê xwe çi zanibe, çi bigire, çi bike; wê li gorî wê, şêwe bigire. Dema ku wiha be jî, jixwe civak nayê avakirin; wê bibe weke keriyek pez û derbas bibe. An jî, weke ku di roja me de di pergala kapîtalîst de pir aşkere derketiye holê; kî bi hêz be, wê serweriya wî derbasdar be.

Lê tê zanîn ku sinc; wijdanê civakê ye, tevna ku civakê di nava hev de digire, bihevrebûnê bi hêz dike û nirxên wan ên hevpar diyar dike.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Sinc çi ye? Pênase bike.**

2- **Çi cudahî di navbera sinc û hiqûqê de heye?**

3- **Çima feylezof ta niha, der barê sinc de negihîştine pênaseyeke hevpar?**

4- **Hin rêgezên sincî yên civakê, diyar bike.**

5- **Bi kurtasî, rista sinc a di nava civakê de şîrove bike.**

Wane 2

DI CIVAKÊ DE HIZIRANDINA BAWERIYÊ Û GIRÊDANA BI SINC RE

Bawerî: Forma yekem a zanîn, têgihîştin û hizirînê ye.

Hişê mirovan, cara yekem bi şêwaza baweriya hizirî ye. Ev, rê li ber tevgerên civakbûnê yên bi derdorê re, nêzîkatiya ji mirovan re û tevlîbûna ji civakê re bi tevahî yên sincî vekiriye.

Her endamê civakê derdora xwe bi rêgezên sincî têgihîştine. Ji ber ku bûyer û rûdanên derdora xwe, tenê di aliyê bawerî û warê sincî de têgihîştine.

Îro hemû qalibên hişmendiya ku em qala wan dikin û hemû pêvajoyên hizirandinê; koka xwe ji sincê mirovahiyê yê destpêkê digirin.

Sinc: Bi baweriya mirovan a karîgerî ava bûye. Mayîndebûna pêşketina civakî û afirandinên derfetên mirovan ên mirovbûnê pêş dixe. Sinc dibe sedem ku ji van çavkaniyan, her wiha bingehan bawer bike. Jixwe nirxên mayînde, ji nirxên ku mirovan jê bawer kirine, ava bûne.

Mirov, hebûneke ku bi xwe bawer dike ye. Di vir de baweriya ku tê ziman, bi taybetî ne şêwaza baweriya ku di olên yek xwedayî de tê gotin e.

Mirovên destpêkê, bi hebûna xwe bawer kirine. Hebûnên li derdora xwe yên ku derfetan didin jiyanê, nas kirine û bawer kirine.

Di vê wateyê de tiştê ku jê tê bawerkirin, tiştê ku lewazî û bêhêziya mirovan dide derbaskirin e. Tevî hemû neyîniyan, mirov bûyerên ku rê li ber jiyanê digirin, vekirine.

Mirovên di dema destpêkê de rista sinc baş tênegihîştine.


Klan

Ev jî bûye sedem ku diyardeyên rê didin hebûna mirov, bi şêweyên cur bi cur pênase bikin an jî bidin naskirin. Ji bo pêşketina civakî, ev encameke asayî ye. Ji ber ku mirov her tiştî bi carekê re nikare bide naskirin. Ev taybetmendî, bi mirovan re taybetmendiya ku bi carekê re her tişt nayê naskirin, an jî nayê têgihîştin e. Ev taybetmendiyeke mirovan bi xwe ye. Ji ber vê yekê, tiştên ku jê tên bawerkirin, ji encamên bisûd hatine girtin.

Bawerî jî, şêweyekî zanînê ye. Zanînên ku bi baweriyê tên naskirin, di bingeha xwe de tiştên herî mirovî ne. Diyardeyên ku jê tên bawerkirin, bi awayekî bê pirs tên pejirandin.

Bi demê re çanda deshilatdariyê bi vê rêgezê lîstiye û ev şêwaza baweriyê yê bê pirs û zanîn, li gorî berjewendiyên xwe veguhartine. Ev jî, bûye sedem ku hemû cîhan bê pirs û zanîn, hemû serdestên cîhanê bipejirîne.

Girîngiya baweriyê ya di sinc de

Sincbûn; beriya her tiştî, divê mirov bi tiştekî bawer bike.

Dikare gelek zanîn, zanist û berhemên binirx biafirîne. Lê belê, derxistina gelek berhem û nirxên dewlemend ên zanist û zanînê, nayê wê wateyê ku mirov û pergala ev derxistine, xwedî sinc in.

Ji bo sincbûnê, ev tenê têrê nakin. Girêdayî van, divê bawerî jî hebe.

Dibe ku mirovek gelek tiştan zanibe, yan ji aliyê daringî ve gelek dewlemend be, yan jî xwediyê gelek amûrên ku xwedî derfeta çareseriya pirsgirêkên civakî be, lê dibe ku ew mirov bê sinc be.

Her wiha, dema ku em sincê di nava çandê de dinirxînin, em baweriyê di navend û bingeha wê de bi cih dikin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Çi cudahî di navbera sinc û baweriyê de heye?

2- Çima çanda desthilatdar, şêwaza baweriyê ya bê pirs û zanîn li gorî berjewendiyên xwe daye veguhartin?

3- Valahiyên li jêr, bi peyvên guncav dagire.

- Her endamê civakê derdora xwe bi rêgezên sincî, ...
- Bawerî, şêwazeke .... ye.
- Diyardeyên ku tên bawerkirin, bi awayekî bê pirs tên ……….
- Mirovên destpêkê, bi hebûna xwe ....

Wane 3

SINC WIJDANÊ CIVAKÊ YE



Wijdan; hêza hişmendiya mirov û derfeta bijartina bedew û baş a bi pîvan û rast e. Eger wijdan nebe, wê di navbera mirovan de zagona daristanan derbasdar bin. Eger bi danîna hin rêgezên jiyana mirov re ji zindîwerên din civakbûneke cuda jiyan dikin, deyndarê wijdan in. Di navbera mirovan de bi bijartina cudahiya başî û xerabiyê re wijdan derdikeve hole.

Eger em tevger û biryarekê bi cih nekin, em ê bi awayekî bêmafî wijdan pênase bikin. Sedema van, eşkerekirina diyardeya wijdan a di mirovan de ye.

Çavkaniya herî bihêz a ku diyardeya wijdan ava dike û weke taybetmendiyekê derdixe hole, sinc e.

Di vê wateyê de tişta ku tevgerên me yên rojane yên bi wijdan, pîvanên me yên pejirandin û redkirinê eşkere dikin, sinc e.

Sinc, di destpêkê de bi wijdan re, karîger dibe. Mirovên ku wijdanê wan tune be, weke mirovên bê sinc, an jî mirovên ku sincê wan xerab bûye, tên naskirin.

Di jiyanê de ji mirovên ku bê wijdan bin, xerabî tên hêvîkirin. Sedema vê ya bingehîn, bê sinciya wan e.

Civakbûn her wiha sinc, bi derbasbûna civaka çînî re xerab dibin. Awayekî çînî digire û li gorî çînayetiyê tê guhartin.

Li gorî civakên çînî, dewletî, sinc ezezîbûneke weke ku xwe ji derdorê veqetandiye. Civakbûn û sinc, li hemberî pêşketina xwe weke astengiyekê dibînin. Bi hemû kiryarên xwe, dixwazin xwe ji vê rizgar bikin. Ev jî, beramberî xwe hişmendiyek û têgeheke nû ava dike. Lê belê, hişmendiya nû ya tê avakirin, asteke dij-şoreşê bi xwe re hildigire. Hişmendiya ku girêdana xwe ji sinc qut kiriye, bê nirx e. Eger weke wijdanê civakê, sinc bêhizir be; wê ji civakê qut bibe û bê wijdan be.

Dîroka civaka çînî, ji ber pêşveçûna xwezayî ya mirovahiyê bi rêbazên ne li rê xerab dike, dîroka bêsincî û bêwijdaniyê ye.

Hemû şer, kuştin û tunekirin ji ber van sedeman e. Civaka klan a ku sincê xwe bi **totema** xwe ava kiriye, ji ber ku hemû tiştên li derdora xwe, weke xwe zindî û pîroz dibîne, zirarê nedane wan.

Em ji kolekirina mirovan bigirin, ta xerabkirina xwezayê, çavkaniya hemû pirsgirêkan û biyanîbûna civakê ya ji nirxên xwe yên avabûnê, dûrketina ji sinc e.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Wijdan, pênase bike.**

2- **Eger wijdan di nava mirovan de nebe, wê çi derkeve holê?**

3- **Çavkaniya herî bihêz a ku diyardeya wijdan ava dike, çi ye?**

4- **Çima di nava jiyanê de ji mirovên bê wijdan, xerabî tên hêvîkirin?**

5- **Çima dîroka civaka çînî, dîrokeke bêsincî û bêwijdanî ye?**

Wane 4

DI SINC DE AZADÎ

Azadî; têgeheke ku mirovan bi xwe pênase kiriye. Dema ku behsa azadiyê tê kirin, divê di serî de behsa mirovbûnê bê kirin.

Dema mirov tê gotin, çi tê têgihîştin? Mirov ne tenê hebûneke fîzîkî ye. Di asta biyolojîk de di navbera mirov û zindîwerên din de cudahiyeke pir kêm heye. Ya ku mirov dike mirov, hebûna mirov a civakî ye. Hiş û hest, ji ber ku di nava civak û civakbûnê de pêş dikevin, derveyî mirov û civakê hiş û hestiyarî nayên hizirîn.

Ji bo ku hişê mirov weke pêşketineke bisûd xwe bibîne, di serî de divê mirovbûn pêş bikeve. Mirov, hebûneke komînal û demokratîk e.

Eger mirovek hişê xwe ji bo tîbûn û birçîbûna mirovan bi kar bîne, em nikarin ji wî kesî re bêjin mirov.

Mirovên ku xwedî hişê stemkariyê ya li ser mirovan bîne, ji mirovbûnê dûr in. Ev mirov an jî mirovên ku ji aliyê fîzîkî ve mirov in, bi rastî jî nayê wê wateyê ku mirovên civakî ne.

Ev mirovên xwedî pirsgirêk, mirovên nexweş in.

Her wiha, divê hiş ji mirovan re azadiyê bîne. Wê demê divê em vê pirsê bikin, azadî çi ye? Azadî beriya her tiştî, avakirina

mirov a her kêliyê ye. Yanî weke hebûneke komînal, mirov di nava civakbûna xwe de derfeta xwe ya bijartina baş, bedew û rast pêş bixe ye.

Weke tê zanîn, mirov di nava civakbûna xwe de mezin dibe. Yên bedew, baş û rast jî yên civakbûnê bi xwe ne.

Bi gotineke din, ji bo hebûnê yan jî avabûnê, divê civakbûn û xebata rast a vê civakê hebin.

Di nava civakeke rast de sincê rast derdikeve holê. Ji ber ku civak di sinc de, hebûna xwe dibîne.

Dema ku civaka rast dixebite, di heman demê de civaka ku endamên xwe yên bi xwe hesiyane, yan jî cudahiya xwe nas kirine, avakirinê çêdike.

Ji ber van rastiyan, ew civak bi sinc e. Ji ber vê yekê, baweriya bi civaka ku endamên xwe pêş dixe, wan di xebitandinê de wê bibe sedem ku riya pêşketina azadiyê jî were vekirin.

Di vê wateyê de qada yekem a ku sincê civakî lê derketiye, dibe qada azadiyê.

Sinc, di azadiyê de hebûna xwe dibîne. Azadî jî, bi pîvan û rêgezên sinc watedar dibe. Ji asta aşopiyê derdikeve û dibe armanca yekem a mirovan a di qada karîgeriyê de.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Azadî, çi ye?

2- Ya ku mirov dike mirov, çi ye?

3- Çima di nava civakeke rast de sincê rast derdikeve holê.

4- Valahiyên li jêr, bi peyvên guncav dagire.

- Mirov, hebûneke komînal û ………… e.
- Mirovên ku xwedî hişê stemkariyê li ser mirovan bîne, ji mirovbûnê ………. in.
- Mirovên ku ji aliyê fîzîkî ve mirov in, nayê wateya ku mirovên ………… ne.

Wane 5

DI SINC DE BERPIRSIYARÎ

Taybetmendiya mirov a sereke, hesta berpirsiyarî û hizirandina wî ye.

Berpirsiyarî, di kesayetê de hem karekî pîroz hem jî zanîn e.

Di nava civaka xwedî sinc de mirov ji kesî re nabêje vê bike, yan jî vê neke. Ya ku dike sinc bi xwe ye.

Sinc, mirov dike xwedî berpirsiyareke mezin. Mirovên xwedî berpirsiyarî, mirovên xwedî zanabûna pêwîstiyên civakê yên giştî ne.

Mirovên berpirsiyar, hemû pirsgirêkên cîhanê weke pirsgirêkên xwe dibînin. Cîhan, li ser pişta mirovên berpirsiyar dibe barekî giran. Mirovên berpirsiyar, çawa ku her kesî ji şaşî û xerabiyan diparêzin, xwe jî diparêzin. Li hemberî mirovên derdora xwe, kesên nas û ne nas, ji her kesî re wekhev nêzîk dibin. Êşên wan parve dikin. Ji kêfxweşiyên her kesî re dibin heval.

Hin axaftin ji bo tevgerên mirovan wiha hatine gotin. Dibêjin: **Êş; bi parvekirinê kêm dibin, kêfxweşî; bi parvekirinê zêde dibin.**

Ev, nîşaneke sincî ye. Berpirsiyarî, jehra desthilatiyê ye. Dema ku mirovan ev xebatên xwe yên civakî bi cih neanîn û valahî derket holê, hin mirovên berjewendîxwaz bi helwestên xwe yên qirêj ev valahî dagirtin û dan bikaranîn. Kêmbûna van hestên berpisriyariyê, di kesayetê de bêxemî pêş xist.

Mînak: Mirovek xwedî hestên berpirsiyariyê, yek kêliyê jî di cihê xwe de nasekine. Mirovên berpirsiyar, mirovên xwedî hestên mezin ên berpirsiyariyê û xwedî sinc in. Bê berpirsiyarî, bê sincî ye.

Mirovên xwedî sinc û berpirsiyariyê, erk û pêwîstiyên hene bi kêfxweşî bi cih tînin.

Di sinc de zagon

Zagonên civakî, zagonên sincî ne. Civak, hêza herî mezin a bîra civakî ye. Ji ber ku mirov hêza civakê tênegihîştiye, ev hêz bi şêweyên cur bi cur dane naskirin. Jixwe bawerî, ji mezinbûna hêza civakî ava bûye. Hêza sinc, ji hêza civakbûnê tê.

Di nava civakê de hin tiştên ku divê qet neyên kirin, hene. Eger mirov van tiştan bike, wê bê sezakirin.

Ev kiryar, ji ber sedema sincê civakê tên pêkanîn.

Mînak: Her çi qasî werin zanîn û nivîsîn jî, rêgezên hiqûqî dikare bi hêsanî werin binpêkirin. Lê belê, tevî ku rêgezên sincî nehatine nivîsîn, binpêkirina wê nabe. Jixwe binpêkirina pîvanên sincî di wateyeke din de mirin e. Tê wateya ji nava civakê avêtin e. Bê guman, jiyana civakî dewlemend û pir reng e.

Divê xwediyê guhartinê, ji nava gelek rê û bijareyan, riyekê hilbijêre. Ji ber ku di encamê de kêliya bimeşe; di yek rê û yek alî de pêk tê.

Sincbûn, di nava rêgezên karê civakî de bi xwe ta radeyekê derfeta mafê hilbijartinê nade mirov. Ji ber ku rêgeza sinc, rêgeza hebûnê ye. Dema ku ev rêgez nebe, kar û jiyan jî nabe.

Bêrêgezî, dikare riya rewşên mirinê ava bike. Lê mirov di nava hemû karan de ji bo xwe aliyê herî baş hildibijêre. Ev bijartin, ne neçarî ye, li gorî pêwîstiyan tê bidestgirtin. Ji bo

bersivdayîna pêwîstiyên civakî; tiştên herî baş û bisûd dîtin û derxistina holê, gelek zor e. Ji nava gelek xebatan, xebatek hilbijartin bi xwe azadî ye. Ji ber ku ji nava gelek rê û rêbazan, yek hilbijartin, karê zanîn û zanabûnê dixwaze.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Taybetmendiyên mirovên berpirsiyar ên di civakê de diyar bike.**
2- **Di civakê de çi cudahî di navbera rêgezên hiqûqî û sincî de, heye?**
3- **Çima sincbûn di nava rêgezên karê civakî de ta radeyekê derfeta mafê hilbijartinê nade mirov?**
4- **Valahiyên li jêr, bi peyvên guncav dagire.**

- Berpirsiyarî, di kesayetê de hem karekî pîroz hem jî …………. e.
- Êş; bi parvekirinê kêm dibin, kêfxweşî; bi parvekirinê ....
- Bê berpirsiyarî, bê ………... ye.
- Hêza sinc, ji hêza .... tê.

Wane 6

TÊKILIYA OLÊ YA BI SINC RE

Sinc, saziyeke ku ji beriya olê hatiye sazkirin e.

Rêgezên ku ji aliyên sinc ve hatine qedexekirin, zêdetir hêmanên dilovaniyê hildigire nava xwe, ol e.

Bi demê re dibe kevneşopiyeke pir hişk. Di vê wateyê de ol, bi mirov re dibe sazûmaniya herdemî û rêgeza herî hişk.

Tevî ku ol ji nava sinc derdikeve û beşekê ji sinc rave dike, li gorî şert û mercên cih û demê bi hêz dibe, sazî û rêgezên xwe hişktir dike û dibe zagonên serbixwe yên olî ku divê her kes wan pêk bîne.

Ol, dikare bi hiqûqê re jî were destgirtin. Ji ber ku bi derketina hiqûqê re jî, her du weke hev in. Beşeke hiqûqê, di dema xwe ya destpêkê de bi sinc ve girêdayî ye. Ev rêgez, bi dewletbûnê re cih dide veguhartinê, dibe zagonên hişk û dibin zagonên hiqûqî yên weke roja me ya îro.

Bi pêşketina şaristaniyê re ol bi cudabûna ji zagonê, jiyan kir. Ji aliyê hêzên dagirker û serwer ve, li gorî berjewendiyên xwe dan guhartin, bûn rêgezên herî giran ên xwedayî ku civakê bi sezayên giran seza dikin.

Berjewendiyên yekdestan ên ku bi destê dewletê ji aliyê hiqûqî ve dihatin birêvebirin, xwest ku bi xweda û olên nû yên ku mohra şaristaniya nû hildigirtin, bide birêvebirin.

Ol; saziyeke ku beriya şaristaniyê ye û di mercên ku ol hîna ramanên şaristaniyê tênegihîştibû de, bi sinc û demokrasiyê re di nava hev de jiyan dikir.

Têkiliya Sinc Û Hiqûqê

Hiqûq, tê wateya rêgezên ku di nava civakê de, bi riya hêzê tên bikaranîn, dibe ku bi devkî yan jî nivîskî be.

Di demên destpêka civakbûnê ya klan û hozan de zêde behsa hiqûqê nayê kirin. Rêgezên bi navê tore, di wateyekê de zagonên xwezayî ji ber xwe ve tên pêkanîn. Navê din yê toreyê jî, sinc e. Cudahiya di navbera sinc û hiqûqê de ev e: Hiqûq; bi hêzê tê birêvebirin, demeke tê diyarkirin û divê di nava wê demê de her tişt were çareserkirin.

Hamûrabî

Sinc, ne bi hêzê ve tê birêvebirin. Sinc; di bingeha xwe de van rêgezên civakî, berbiçav dike û hewl dide van rêgezan bişopîne û civakbûnê berdewam bike. Hiqûq, yek ji hebûna civaka hemdem a girîng e. Bi taybetî; bi dabeşbûna civakê, çînayetî û bi dewletbûnê ve girêdayî ye û dikeve cihê bingeha sinc. Lê çawa ku pîroziyên bi dewletbûnê ve girêdayî; rê li ber ola dewletî vedike, bi dewletbûna sinc re jî; rê li ber hiqûqê vedike.

Şaristaniya Sumer

Em di civaka sumeran de rastî mînaka yekem a hiqûqê tên. Beriya qanûnên **Hamûrabî** bi demeke dirêj em rastî nivîsarên nivîskî tên û di wan nivîsaran de zagon hebû. Her wiha, derketina hiqûqê; ne di Roma û Atînayê de hatiye nivîsandin. Di dema Roma û Atînayê de hiqûqê heye, bi sinc û demokrasiyê re têkildar û bi wan ve girêdayî ye.

Derketina sinc û demokrasiyê jî, ji bo ku ser qraltî û dîktatoran were nixumandin, aliyê rêveberiya arîstokrasiyê (ev jî; mirovên bijare û efendiyên civaka koledar in) ya hevbeş rave dike.

Her çi qas em şopên wan di nivîsarên (metinên nivîskî) sumeran de nebînin jî, raveya vê ya nivîskî û fermî di pêvajoya şaristaniya Roma û Atînayê de tê dîtin. Derketina sinc û demokrasiyê; bi derbaskirina zor û gengeşeyên nava xebata rêveberiyê, yan jî bi navekî din bi aloziya nava rêveberiyê re têkildar e. Civaka sincî, di şert û mercên modernîteya kapîtalîst de dîroka xwe ya herî tengav û bê kar jiyan dike. Her wiha, weke ku di tu dema dîrokê de nehatiye dîtin, li cihê rêgezên sincî, rêgezên hiqûqî hatine bicihkirin. Çîna burjûwazî tê bêsinckirin, di bin navê hiqûqê de serdestiya çînî li ser civakê tê sepandin. Li cihê civaka sincî, civaka hiqûqî tê amadekirin. Cihê hiqûqê, di nava civakê de heye. Di vê wateyê de dev jê nayê berdan. Lê belê, di bin navê hiqûqa erênî de hiqûqa dewletê ya ku li ser civakê tê sepandin, ne hiqûqa dadê ye; hiqûqa yekdest a netewe û çîna serdest e. Li vê derê sinc tê binpêkirin û xerabkirin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Çima ol dikare bi hiqûqê re were destgirtin?**
2- **Ol, ji aliyê hêzên dagirker û serwer ve li gorî berjewendiyên xwe, çawa li ser civakê hatiye birêvebirin?**
3- **Hiqûqê pênase bike û cara yekem li ku derê hatiye nivîsandin?**
4- **Cudahiya di navbera sinc û hiqûqê de çi ye?**
5- **Çîna burjûwazî, bi navê hiqûqê bandoreke çawa li ser civakê dike?**

Wane 7

VEGERA SINCÊ CIVAKÎ

Civakbûn; ji bo mirovan, jiyan bi xwe ye. Ji ber ku mirov bi civakbûnê re jiyana xwe berdewam dike.

Hêmana ku di civakê de mirov diparêze, çêkera wî ya sincî ye.

Şarîstaniya 5 hezar sal û ya beriya wê ku çêkera civakê li ser lingan digire, civaka sincî û polîtîk e.

Sinc; hêzeke herî bingehîn a ku mirov dike civakî û berdewamiya mirov herdemî dike.

Dema ku çêkera sincî lewaz dibe; dibe sedem ku çêkera civakî jî, lewaz bibe. Bi taybetî, di dema modernîteya kapîtalist de sinc ketiye rewşa xwe ya herî lewaz.

Ji bo ku çêkera civakî parçe bikin, sincê civakê xerab kirin.

Ji bo ku binesaziyên civakî werin parçekirin, sincê civakê hatiye pûçkirin. Ev nêzîkatî, bi demê re bûne sedem ku pirsgirêkan jiyan bikin, ji aliyê mirov û xwezayê ve neyên birêvebirin, rû bidin. Sedema bingehîn a vê rewşê, windakirina sincê civakê ye. Ji ber vê sedemê û ji bo berdewamkirina jiyanê; vegera sincê civakî, xwe bi awayekî lezgîn dide hîskirin.



Têkoşînên azadiyê, bi pêşketina şaristaniya çînî re derketine holê. Ji ber ku bi pêşketina şaristaniya çînî re mirov diyardeyên; dagirkerî, çînayetî, bêmafî, sitemkarî, şer û hwd. nas kirin.

Beriya wê civaka ku em dibêjin civaka demokratîk û komînal a civaka

xwezayî, mirovan bi şêweyekî wekhev, azad û aştiyane jiyana xwe berdewam dikirin. Di nava civakê de, şer ne mijara gotinê bû.

Şerê di navbera wan de dihat birêvebirin, ji bo lihevanîna şert û mercên wan û xwezayê bû.

Kengî mirov bi diyardeya dagirkeriyê re rû bi rû ma, wê demê li hemberî bêmafiyê jî kete nava têkoşînê.

Têkoşînên azadiyê, di bingeha xwe de sincê civakî pêş xistine. Ji ber ku civakek, an jî pergaleke ku sincê wê xurt e, rewşeke bêmafî û zirarê bide mirov an jî civakê tune ye. Têkoşînên azadiyê, ji ber xerabûna sincê civakê û encama bêmafiyan pêş ketine. Têkoşîna bindestan a ku li hemberî serdestan didin, di bingeha xwe de têkoşînên sincî ne.

Nezanabûn

Sokrates

Sokrates dibêje; "Nezanabûn, dayîka giştî ya xerabî, şaşî û tevlîheviyan e."

''Mirovên ku dixwazin riya başiyê vekin, pêwîst e zanabûna wê jî bigirin''

Zanist; mirovan ber bi tevgera rast ve dibe, tevgera rast jî; ber bi bextewariyê ve dibe. Ji bo ku mirov nêzîkatiyên xwe rast bike; pêwîst e, xwedî zanist be û başî û xerabiyan ji hev cuda bike. Ji ber vê sedemê, mirov bi **xwe naskirinê** digihêje kesayateke têgihîştî.

Ev jî, tişta herî bingehîn a pêwîst e. Ji ber ku nezanabûn, dibe sedem ku mirov ji xerabiyan re bibe bingeh.

Ji bo berdewamkirina hebûna civakî, pêwîst e çêkera sincî were xurtkirin. Di nava têkiliyên civakî de rêgezên sincî ku pêwîst e werin pêkanîn, bi riya hiş ve tê têgihîştin û pêkanîn. Ji bo van jî, rêgeza sincbûnê ya bingehîn, **xwe naskirin** e.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Çima civakbûn; ji bo mirovan, jiyan bi xwe ye?**

2- **Çawa çêkera civakî, lewaz dibe?**

3- **Çawa mirov di civaka xwezayî de jiyana xwe berdewam dikir?**

4- **Di civakê de têkoşînên azadiyê kengî derketine holê?**

5- **Ji bo mirov çi pêwîst e ku nêzîkatiyên xwe rast bike?**

Wane 8

ALIYÊN SINCÎ YÊN TÊKOŞÎNÊN AZADIYÊ-1

1- Berpirsiyarî

Mirov; bê civak û civak jî; bê mirov nabe. Ya ku çêkera civakî li ser lingan girtiye û civaka ku bi endamên xwe ve xwe bihêz kiriye, avaniyên sincî ne. Ji ber ku windabûna sinc, dibe sedema ku civak bikeve rewşeke lewazbûnê, ev yek jî tê wateya tunebûna civakê. Ji bo ku hebûna avaniyên civakî pêk werin, divê mirovên di nava civakê de erkên xwe yên civakî bi cih bînin.

2- Jin, Weke Bingeha Jiyana Civakî

Dîroka desthilatdariyê, li ser bingeha şaristaniya civaka çînayetî li ser zayenda jinan bi rêbazên dîroka derew, kolebûn, zordestî, şer û dagirkeriyê dest pê kiriye.

Têkoşîna azadiya jinê, bi serkeftina jinê re; bi azadî, aştî û wekhevî ve dîrok wê rast were nivîsandin. Hemû nîşane diyar dikin ku di dema şaristaniya nû de jin wê rista xwe di asteke bilindtir de bilîze, ji ber ku weke çîna herî kevn li hemberî jinan, dagirkerî û fişara herî zêde hatiye birêvebirin.

Di dema derbasbûna baviksalariyê de ji bo jinan, rê li ber windahiyên mezin vekirine. Dîroka 5 hezar sal a civaka çînayetî, herî zêde bi jinan daye windakirin. Ji pir aliyan ve bindestî,

heqaret, cudabûna zayendî û newekhevî li hemberî jinê bi rê ve birine. Weke ku jin hatiye şewitandin, hatiye hilweşandin, hewl dide ku ji xweliyê, xwe paqij bike û derkeve. Bi destpêkirina serdema jinan re wê di pirsgirêkên weke; mafê mirovan, mafê çandî û civakî, pirsgirêkên xweza û hawirdorê de vebûn were çêkirin.

Pêwîst e jin, weke hêza aştî û demokrasiyê xwe bixe rojevê. Jin; weke hêza herî biryardar, di qada çandî û hunerî de ye.

3- Hezkirin û Rêzdayîna Li Hemberî Zarok, Pîr û Kalan

Zarok, bingeha avakirina civaka pêşerojê ne. Ji ber vê sedemê, nêzîkatiya li hemberî zarokan pir girîng e. Di nava hemû zarokên zindiyan de zarokên mirov ê ku herî zehmet pêş dikevin. Ji ber vê yekê jî, pêwîstî bi nêzîkatiyeke zanistî û taybet heye. Sazûmaniya ku bingeha xwe ji serdestiya zilam a hovane digire, piştî kolekirina jin û kedkaran; herî zêde bandora xwe li ser zarokan daye çêkirin. Ji ber ku pergala zilam; ew qas kor, bê wijdan û stemkar e ku qet nikare zarokan nas bike.

Di dema destpêkê ya civaka çînayetiyê de zarok ji xwedayan re dihatin qurbankirin. Dibe ku niha qurbanên fîzîkî nayên dayîn, lê belê qurbankirina rewanî, ji leza xwe tu tişt winda nekiriye û berdewam dike.

Jina bi wijdan; dikare ji zilam zêdetir, derûniya zarokan nas bike. Rêbazên dewletê, vê cîhana zarokan bi tevahî biyanî dike. Ev çarçove, pêwîst dike ku mafên zarokan bi şêwazeke berfireh ji nû ve were sererastkirin. Di serî de beşên perwerde, tenduristî, lîstok û hezkirina dayîkê, her wiha divê mafê zarokan neyê derengxistin û were bicihanîn.

Pêwîst e, weke civak bi nêzîkatiyeke hestiyarî, bi hezkirinê zarok werin mezinkirin û fîzyolojiya wan were têgihîştin.

Ev, ji bo perwerdeyeke rast were dayîn û bigihêjin kesayeteke rast, gelek girîng e. Welatên pêşketî di vê mijarê de di nava nêzîkatiyeke hestiyar de ne. Bi taybetî jî, di perwerde û hunera zarokan de pêş dixe.

Karîgerên ku tên jiyankirin, li hemberî pîr û kalan rexnedayînekê derdixin holê. Dibe ku pîr û kal ji aliyê fîzîkî ve zêde ne hilberîner bin. Lê belê yên pîr û kal ji ber ezmûnên wan ên jiyanê yên bi salane, xwedî zanabûneke jiyana rast in. Çêkera bingehîn a civakî ava dikin. Ji bo çêkera civakeke bi tendurist, nêzîkatiya ji wan re gelek gîring e. Rêzdayîna ji pîr û kalan re, ji ber ezmûnên wan û sûdwergirtina ji zanabûna wan e.

Berovajî vê yekê, wê hemû nêzîkatî bibin sedema ketina dijberî xwe. Ji ber ku yên çêkera civakî ta roja me anîne; ked û helwesta pîr û kalan e.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Ji bo ku hebûna avaniyên civakî pêk werin, divê mirov çi bike?**

2- **Çawa dîrok; li ser bingeha şaristaniya civaka çînayetiyê, li ser zayenda jinan dest pê kiriye.**

3- **Dîroka 5 hezar sal a civaka çînayetiyê, herî zêde bi jinan daye windakirin. Şîrove bike.**

4- **Çima sazûmaniya ku bingeha xwe ji serdestiya zilam a hovane digire, qet nikare zarokan nas bike?**

5- **Sedema kolekirina jin û zarokan şîrove bike.**

Wane 9

ALIYÊN SINCÎ YÊN TÊKOŞÎNÊN AZADIYÊ-2

1- Hezkirina xweza û zindiyan

Hevsengiya xwezayî ya ekolojiyê heye. Zindîbûn û curbicurbûna xwezayê, sedema hebûna jiyanê ye. Di dema civaka xwezayî de, di navbera xweza û mirov de tu pirsgirêkeke girîng nedihat jiyankirin. Sedema wê jî, nêzîkatiya bi rêzdarî ya li hemberî xwezayê bû. Xweza, rêgeza parastinê ya ku weke dayîk dihat dîtin. Sûdwergirtina ji xwezayê, li ser bingeha pêdiviyan bû.

Derveyî pêdiviyan, mirov dest nedida zindiyên xwezayê. Lê belê, kengî şaristaniya çînayetî pêş ket, dema ku mirov xwe xiste bin serdestiya mirov, di wê demê de mirov û xweza ji hev dûr ketin. Vedana hizira hiyerarşiyê; xweza weke hov û tişt(obje) didîtin, ev bû sedem ku di navbera mirov û xwezayê de pirsgirêk derkevin. Ev nêzîkatî, bû sedem ku pirsgirêkên mezin derkevin û berdewam bikin.

Di roja me de pirsgirêkên ekolojiyê, gihîştine asta herî bilind. Di bingeha mezinbûna şênî û qirêjbûna xwezayê de, hizira kapîtalîzm a ku rist lîstiye, heye. Pirsgirêkên ser û binê erdê, atmosfer û avhewayê gihîştiye rewşeke ku jiyan neyê jiyankirin û mirovahî di rewşeke ku bi gelek metirsiyan re rû bi rû bimîne.

Ji ber ku hevsengiya xwezayî ya ekolojiyê heye. Yê ku hevsengiya xwezayî wêran dike, mirov e. Lê xweza, di nava xwe de bi hemû zindîweran re di nava hevsengiyê de ye.

Mînak: Dualiya mişk-mar hevsengiyekê çêdike. Dema ku mar nebûna, dibe ku mişk weke dînazoran metirsiyê çêke. Ji bo ku pirsgirêkên hene, werin derbaskirin; divê em bigihêjin zanabûnekê ku her zindî wateyeke hebûna wî/ê heye. Ji bilî ku em ji wan hez bikin an na, divê ji wan re rêz were dayîn û jiyana wan biparêzin.

2- Naskirina dîroka xwe

Dîrok, şîroveya hebûnê û pêkanîna pêvajoyê ye.

Çi qas hebûnên cur bi cur hebin, wê ew qas jî dîrok hebe.

Naskirina dîrokê, naskirina xwe ye. Naskirina xwe, naskirina dîrokê ye. Bê dîrokbûn, ji bo civakê bê mejîbûn û bê nasnamebûn e. Bi wê, şêwaza naskirina dîrokê gelek girîng û watedar e. Lê belê, ew qas jî dîrok hatiye berovajîkirin û bêwatekirin.

Dîroka şaristaniyê, tê wateya dîroka windabûna jiyanê û di heman demê de windakirina jinê ye jî.

Sedema windakirina azadîxwazan a bingehîn, li hemberî vegotinên dîrokî yên serweran bin ketine. Ji bo qezenckirina wan, di serî de divê em dîroka xwe baş nas bikin.

3- Parastina nirxên nasname û rêzdariyê

Çand, hilberîneke mirovan e. Çanda civakî, ji bo mirovan nasnameyek e. Her wiha, erdnîgariya ku em li ser jiyan dikin; dewlemendî, pir rengî, curbicurbûna ku çandê diafirîne.

Lê belê, nêzîkatiyên serdestan ên ku ji bo berjewendiyên xwe civakê winda bike, dijminatiyê li ser nasnameya çandên civakî dike.

Ji bo mirov nêzîkatiya herî bêrêz û bêsinc, ew e ku nirxên nasnameya xwe winda dike û ji çanda xwe dûr dikeve.

Her gel; bi pêkanîna mafê xwe re çanda xwe jiyan dike û pêş dixe, dikare di wateya rast de civaka azad û demokratîk ava bike.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Çima di dema civaka xwezayî de, di navbera xweza û mirov de tu pirsgirêkên girîng nehatine jiyankirin?**

2- **Kengî pirsgirêk ket navbera mirov û xwezayê?**

3- **Sedema ku jiyan neyê jiyankirin û mirovahî bi rewşeke gelek metirsîdar re rû bi rû bimîne, çi ye?**

4- **Dîroka şaristaniyê, çi wateyê dide jiyanê?**

5- **Çawa gel dikare civaka azad û demokratîk ava bike?**

6- **Ji bo mirov nêzîkatiya herî bêrêz û bêsinc, çi ye?**

BEŞA ÇAREM

DI QONAXÊN BINGEHÎN DE ÇANDÊN BINGEHÎN

Ji Çanda Medan

- Erdnîgariya Mezopotamya û çanda Aryen
- Belavbûna çanda Aryen
- Civakên etnîkî yên li Mezopotamyayê
- Çanda Semîtîk
- Şaristaniya Misirê
- Şaristaniya Çînê
- Şaristaniya Fenîkeyê
- Şaristaniya Grîko-Romen
- Emerîka

Wane 1

ERDNÎGARIYA MEZOPOTAMYA Û ÇANDA ARYEN

Li gorî teoriya peresanê, dibe ku pirîmatên seretayî di encama mercên avhewayî de, li Efrîqaya Rojhilat pêş ketine. Ev cure bi amûrên seretayî dikarin li ser du lingên xwe bimeşin. Piştî bermahiyên hilweşî yên Derya Spî, Derya Sor û Efrîqaya Rojhilat di belavbûnekê de pêk hatine. Ji demeke nêzî yek milyon sal û vir ve, di Derya Spî ya Rojhilat û kevana Toros-Zagrosê de bi gotina



dîroknasan Kevana Zêrîn e. Ev hebûneke ku her diçe zêde dibe û tê çavdêrîkirin. Ev kêrhatinên ku avhewa, çanda şînatî û lawiran didin, risteke bingehîn dilîzin. Şêniyên ku zêde dibin, ji vê parçeya erdnîgariyê li çar aliyên cîhanê belav dibin.

Koka mirovên Asya û Ewrûpayê yên roja me ji vir tê. Kevana Zêrîn, bi giranî jî navbera Dîcle û Feratê, ango bi navê xwe yê dîrokî **Mezopotamya** di çêbûna civaka seretayî de jî, xwedî risteke çavkaniya bingehîn a sereke ye.

Serdema qeşayê ya dawî (nêzî 20.000 sal beriya niha), avhewaya sar û zuha ku cihê xwe ji mercên avhewaya nerm û baranî re hiştiye, (di navbera salên 15.000 û 12.000 B.Z. de) rê li ber pêşketina civaka **mezolotîkê** vekiriye. Li herêmê gelek taybetmendiyên civaka mezolotîk tên dîtin.

Avhewa, di pêşketina civakî de xwedî bandoreke gelek girîng e. Zuhabûneke ku ji nişka ve beriya nêzî 10.000 sal hatiye jiyîn; li şûna pêşketina bi şêweyê ku ji nêçîrvanî û çandiniyê pêk dihat, rê li ber pêvajoya ku jê re **Şoreşa Neolotîkê** tê gotin, ango dema kevirê şayîkirî vekiriye.

Ji Serdema Qeşayê

Ta niha, weke dîroka herî kevn, li beşên jor ên Dîcle û Feratê, bermahiyên civaka neolotîkê tên dîtin.

Şoreşa neolotîkê, di bingeha xwe de dikare weke şoreşeke gund a ku girêdayî destpêkirina çandiniyê û kedîkirina lawiran jî were pênasekirin.

Erdkolanên ku li Amed, Erxanî Çayonu-Çemê Kote Ber, Batman, Çemê Xalan, Riha û Newala Çore diyar dikin, ku dîroka bicihbûnê digihêje ta 10.000 sal B.Z.

Di bin gelek girên ku di navbera Dîcle û Feratê de ji axê pêk hatine, yekem gundên şoreşa neolotîkê ne, bi navê Gond. Bi kurdî gond, tê wateya gund.

Di zimanê Luwiyan (ew jî dikevin bin zimanê Arî) ku gelê herî kevn ê Anatolyayê de, tê wateya welatê cihên bilind (Gondwana) paşê wê bibe kurdiyan. Di serdema navîn de di zaravaya Selçûqiyên Îranê de wê bibe Kurdistan.

Bi rastî di roja me de jî, ev girên ax ên ku zêde tên dîtin, eşkere nîşan didin ku şoreşa neolotîkê li van deveran bi awayê kûrahî û berfirehî hatiye jiyankirin.

Ta niha, li tu devera cîhanê avahiyeke bicihbûnê ya di vê kevnahiyê de nehatiye dîtin.

Ziman û çanda Aryen

Ziman û çanda Aryen; hem di çêbûna ziman de hem jî ji avanîsaziya jêr a çandeke bi kok re bûne bingeh.

Salên 10.000-4.000 B.Z. ‘dema dirêj’ a ku kêm zêde ev ziman û çand têra xwe bi sazî bûye, rave dike.

Ji bo çandiniyê; gêsin û bikaranîna lawiran, teker, tevn û destar hatine dîtin. Tenê ji kevirê teraşkirî; bivir, kêr, aş û teker, her wiha berhemên avahîsaziyê yên hunerî û olî jî ku nayên çêkirin, lê ji kevirên kanê yên ku em jê re dibêjin **dema kalkolîtîkê**, berhemên kanê tên çêkirin.

Em mînakên vê demê, di roja me de gelekî dibînin. Ji navendên erdkolanên Çiyayê Bradost, Çayonu û herî dawî nêzî Rihayê; mînakên avahîsazî, olî û malên ji kevirê teraşkirî ku hatine çêkirin xwe dispêrin 11.000 sal beriya vê û gelek amûrên ku ji kevirê kanê hatine çêkirin, hene.

Îro jî, ev amûrên çandê yên ku gelê niştecih wan bi kar tînin û peyvên ku wan rave dikin, nasnameya qada bingehîn ronî dikin: ceo(geo-cih), mur(mirin), erd(ax), jin(jiyan, jîn), roj(ro), bra(bira), sol(pêlav), neo(nû), ga(camûs), gran(mezin-giran), guda(xweda) û gelek peyvên ku em dikarin hê jî rêz bikin, ku îro jî di gelek zimanên ewrûpî de tên bikaranîn, pirsgirêka jêderê ronî dikin. Ev peyvên ku hê jî weke kok, di zimanên gel ên resen de yên weke; kurd, faris, efxan û belûcî de hatine naskirin jî yên ziman û çanda Arî ne. Em dikarin bi hêsanî bibînin ku ziman û çanda aryen, ji ber ku kêm zêde ji nîvî zêdetir amûrên bingehîn ên jiyanê ku mirovahî îro bi kar tîne, hilberandiye û sazûman

kiriye. Bingeha zimanê Hind-Ewrûpî jî, di navenda vê şoreşa çandiniyê de pêk hatiye.



Çiyayê Bradost

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Mezopotamya çi ye?**
2- **Prîmatên seretayî çi ne û li ku derê pêş ketine?**
3- **Koka mirovên Asya û Ewrûpayê, ji ku derê ye?**
4- **Navê Kurdistan, bi çi awayî lê hatiye kirin?**
5- **Valahiyên li jêr, bi peyvên guncav dagire.**
   - Serdema qeşayê ya dawî, nêzî ………. sal beriya niha ye.
   - Şoreşa neolotîkê, dema kevirê ....
   - Salên 10.000-4.000 B.Z. ji bo çandiniyê .... û bikaranîna lawiran, teker, ... û .... hatine dîtin.
   - Ji kevirên kanê yên ku em jê re dibêjin dema ...., berhemên kanê tên çêkirin.

Wane 2

BELAVBÛNA ÇANDA ARYEN

Weke nêrîneke zanistî, bi giştî tê pejirandin ku weke civaka mezolotîk û civaka neolotîkê jî, ji Mezopotamyayê belavî çar aliyên cîhanê bûye. Ev, weke serdema herî girîng a belavbûna bingehîn a beriya dîrokê ye. Ji aliyê vegera wê ya civakî ve jî, xwediyê taybetmendiya ku hemû mercên şaristaniyê amade dike û di nava xwe de mezin dike ye.

Civaka neolotîkê, di navbera salên 6.000-4.000 B.Z. di navbera çemê Dîcleya Navîn û peravên Feratê de pêş ketiye. Ev civak, pêvajoya ku jê re tê gotin çanda Til Xelef pêş xistiye.

- Di salên 6.000 B.Z. de hatiye Efrîqaya Başûr-Misir û Ferata jêrîn.
- Di salên 4.000 B.Z. de gihîştiye Çîn û tevahiya Ewrûpayê.
- Di salên 3.000 B.Z. de gihîştiye parzemîna Emerîkayê.

Çanda Til Xelefê hemû amûrên ku ji bo şaristanîbûnê pêwîst in, vedîtiye. Amûrên weke: Dîzik, bivir, gêsin, destar, avahiyên gund, teker, amûrên ji kevirê sifir û hwd.

Ji Çanda Til Xelef

Ev amûrên ku ji bo mirovahiyê ji şaristaniyê re amade dikin, berhemên mezin ên dema destpêkê yên vê dîrokê ne.

Serdema ku çandinî û şivanî bi pêş ketine

Misoger bûye ku gelên Aryen di qada erdnîgariya ku jê re **Kevana Berhemdar (Zêrîn)** tê gotin, di navbera salên 10.000 û 6. 000 B.Z. de dema kedîkirina lawiran û çandiniya neolîtîk in. Ji vir jî, di navbera salên 9.000 û 4.000 B.Z. de li Erebîstan û Bakurê Efrîqayê belav bûne û bûne sedema avabûna çand û zimanê Semîtîk. Navlêkirinên Aryen û Semîtîk, ji aliyê sumeriyan ve hatiye kirin.

Sazîbûn û derbasbûna pergala eşîriyê

Dema ku civaka neolîtîk li Kevana Berhemdar, di nava çanda Til Xelefê de rê li ber sazîbûneke mayînde vekiriye, qonaxeke ku eşîrî girtine nava xwe, bi xwe re anîye.

Komên Aryen û Semîtîk di nava hev de, di qadên hevkariyê de ku kar dikirin, ji hev cuda bûn, ji hozên ku dişibin hev derbasî yekîneyên eşîrên cuda bûne.

Ji bilî ku hişmendî û feraseta eşîrî bi awayekî xurt pêk nehatibe jî, bi hebûnên xwe yên heyberî ve karîbûn bibin civakên bi awayê etnîkî yên weke; Hûrî, Gûtî, Kasît, Mîtanî, Ûrartû û Med.

Cihê kanên dewlemend ên Mezopotamyaya Navîn û Jorîn; di navbera împaratoriyên Anatolî, Babîl, Asûr û di derbasoka nava rojhilat û rojava de ne.

Ev cih, xwediyê avhewayeke ku avdaneke xwezayî pêk tîne û her wiha, ji ber ku xwediyê qadên sewalkarî û çandinî yên herî berhemdar in, rista wê weke dayîka şaristaniyê hatiye binavkirin.

Ji ber van taybetmendiyên wê, di heman demê de her dem dibe qada talan û dagirkeriyê.

Tevî ku qadeke bingehîn a şaristaniyê afirandiye, nikarîbû bibe xwediyê sazî û avahiyên navendî. Ji ber van taybetmendiyên wê, nikarîbû xwe ji herêmeke bûyîna qada şer xelas bike.

Em dikarin bêjin; ta îro jî tu şaristaniyên ku ji vê herêmê xwe xwedî nekirine, tune ne.

Ev taybetmendiya wê, sedema ku îro nikare zimanê xwe bi qasî lawiran jî bi azadî bi kar bîne, rave dike.

Mezopotamya, di Lûwîkî de tê wateya Gondwanayê, di sumerî de jî, wateya Horrît=Welatê Bilind e.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Kengî û li ku derê civaka neolotîkê, pêş ketiye?**

2- **Çend amûrên çanda Til Xelefê ku ji bo şaristanîbûnê pêwîst in, binivîse.**

3- **Çima em Mezopotamyayê weke dayîka dîrokê dibînin?**

4- **Çend civakên bi awayê etnîkî yên li Mezopotamyayê binivîse.**

5- **Hevokên li jêr, sererast bike.**

- Çanda Til Xelefê di salên 8.000 B.Z. de gihîştiye parzemîna Emerîkayê.
- Aryen û Semîtîk ji aliyê Babîliyan ve hatine binavkirin.
- Horrît di zimanê Sumerî de tê wateya Welatê nizm.

Wane 3

CIVAKÊN ETNÎKÎ YÊN LI MEZOPOTAMYAYÊ-1

HÛRÎ: Hûrî û eşîrên ku girêdanên xwe yên bi xizmanî hene, di navbera salên 2.000 û 1.500 B.Z. de konfederasyonek pêk anîne, lê ji aliyê navendîbûnê ve pêşketineke weke Hîtîtiyan bi dest nexistine.

Hûrî; bi Hîtît, komên Lûwî û Xaldiyên ku bingeha wan ên civakî pêk tînin, her tim di nava têkiliyekê de bûn.

Bandorên Sumer, Babîl û Asûriyan bi riya bazirganiyê û ragihandina ber bi Bakur û Rojhilat ve rista xeleka pêşîn lîstine, di avaniya gelek peyv û zimanên wan de hevkarî heye.

Bi gotineke din, qadên bajêr ên Sumer û qadên çandiniyê yên Hûrî, bi hevgirtineke xwezayî jiyan dikin. Ango, şaristaniya navendî ya Hûriyan hema bêje Sumer e.

Pêwîstiyeke xurt nedîtine ku navendeke cuda ava bikin. Ta îro jî, em şopên vê ferasetê bi awayekî xurt jiyan dikin.

Divê were têgihîştin ku îro ev rastiya ku li vê qadê tê jiyankirin bingeha xwe, ji destpêka dîrokê digire.

GÛTÎ: Gûtiyên ku etnîkeke Aryenî ne, ji rojhilatê Sumeran zêdetir li qûntarên Zagrosan jiyan kirine.

Dema ku dewletên bajarî yên Sumeriyan bûne du serî, weke hevgirtiyeke aliyekî tevgeriyane.

Di hilweşandina Xanedaniya Akadên Semîtîk de, Gûtî bi hevgirtina ku bi beşeke rêveberên dewletên bajêr ên Sumeriyan re kirine, risteke bingehîn lîstine.

Xanedanek Gûtiyan

Li vê derê, ji destpêka dîrokê ta îro, hevgirtinên bi vî awayî her tim bi pêş ketine. Wateya peyva Gûtî jî (Gud=ga, gamêş) di kurdiya îro de tê wateya gelê xwedî ga û gamêşan.

Xanedanên Gûtiyan, di navbera salên 2250 û 2150 B.Z. de xanedaniyeke sedsalî ava kirine. Ev xanedan, di axa Sumeran de bandor kiriye.

Piştre jî, vê carê beşek ji rêveberên bajêr ên Sumeran, bi ên Amorîtan re hevgirtinek pêk anîne, ev xanedanî hilweşandine û serweriya xwe berdewam kirine.

KASÎTÎ: Ev beşên xizan ên ku li çolterê kedkarî kirine û li bajarên Sumeriyan jiyan kirine, piranî ji qadên çiyayî yên bakur û rojhilat hatine.

Bi demê re hêdî hêdî hêzên xwe kirine yek û di guhartina xanedanan de risteke girîng lîstine.

Mirov dikare, di êrîşên ku Mîtanî û Hîtîtiyan di salên 1595 B.Z. de birine ser Babîliyan de behsa rista Kasîtiyan bike.

Di warê burokrasî û çandê de li gorî xwe rêbazek afirandine. Mirov dikare şopên vê di wezîrên ji Îranê, Ebasiyan û Selçûqiyan de bibîne. Burokrasiyeke bi vî awayî, bingeha xwe ji Kasîtiyan digire.

MÎTANÎ: Piştî ceribandina konfederasyona Hûriyan, di rewşa federasyoneke hêzdar de ye. Ji nivîsarên ku ji vê derê derketine, tê têgihîştin ku li cihê Çemê Xabûrê jê diherike, bajarekî bi navê Waşûkanî ku tê wateya kaniya xweş (li gorî dîrokê dibe ku bajarê Serêkaniyê be) ava kirine û bi zimanê Hûrî tê axaftin.

Bi giranî, li Mezopotamyaya navîn, li herêma ku îro Riha, Mêrdîn û Şirnex e, serweriya xwe bi rê ve birine. Di salên 1.500 û 1250 B.Z. de jiyan kirine. Hesin, di bin serweriya xwe de hiştine. Di xwedîkirina hespan de navdar in.

Bi Asûr û Hîtîtiyan re her tim di nava şer û pevçûnan de bûne. Herî dawî, ji aliyê împaratorê Asûr Salmanassar ve hatiye hilweşandin.

ÛRARTÛ: (Bi Sumerî, tê wateya welatê cihên bilind)

Ûrartûyan ku her tim bi Asûriyan re di nava berberiyekê de bûn, di salên 870 B.Z. de piştî demeke dirêj a konfederasyonê ber bi sazûmaniya qraliyeteke navendî ve gav avêtine.



Ûrartû, parçeyeke şaristaniya girîng a ku li qeraxên Wanê navendî bûye û xwe dispêre etnîkên Hûrî û Xaldiyan. Tê dîtin ku bingeha xwe ji eşîrên Hûriyan digire, federasyonbûna sist a destpêkê, her ku diçe vediguherînin dewleteke neteweyî. Di navbera salên 1.000 û 700 B.Z. de jiyan kirine.

Ji ber ku xwedî cihên kan, daristan û navendên xwedîkirina hespan bûn, her tim bi êrîşên dijwar ên Asûriyan re rû bi rû mane.

Di vê demê de ji ber ku qralên Asûrî xwedî teknîkên şer ên pêşketî bûn, bûne belaya serê hemû gelan.

Di dîrokê de cara yekem hostatiya çêkirina coka avê ya herî dirêj (56 km) û bendavan kirine.

Nivîsarên pîroz ên Sumeran di dibistanên xwe de didin xwendin. Asûrî, di nava zimanên dewletê de cih digire. Weke ku li her deverê bûye, avaniya çand û ziman a Sumeran bandora xwe li wan jî kiriye.

Lê belê, zimanê eşîrên din cuda ye û pê nayê nivîsandin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Sumer, Babîl û Asûriyan bandoreke çawa li ser jiyana Hûriyan kirine?**
2- **Xanedanên Gûtiyan, çend salan berdewam kirine?**
3- **Çend taybetmendiyên Kasîtiyan, binivîse.**
4- **Mîtanî, bi kîjan çandê navdar in?**
5- **Çima Ûrartû her tim bi êrîşên dijwar ên Asûriyan re rû bi rû mane?**
6- **Çima qralên Asûrî, bûne belaya serê hemû gelan?**

Wane 4

CIVAKÊN ETNÎKÎ YÊN LI MEZOPOTAMYAYÊ-2

MED: Derketina dawî ya bêhempa ya nifşê pêşî yê împaratoriya Med û Pers in.

Quriş qralê yekem ê Medan

Yên ku derketinê amade dikin, Med in. Beşa pêşketî û hêzdar ê Aryenan pêk tînin.

Tê dîtin ku di rêzeçiyayên Zagrosê de jiya ne.

Mirov dikare bingeha wan ta Gûtî û Kasîtan jî bibe. Nêrîneke hevpar a ku tê pejirandin, di nava Hûriyan de mane.

Yek ji eşîrên ku bi Asûriyan re herî zêde şer kirine û êş kişandine.

Dewletbûna wan, ji nêz ve bi vê berxwedanê re peywendîdar e. Tê gotin ku Medan, bi navê **Ekbant** (li Îrana niha li nêzî Hemedanê ye) paytexteke navdar ava kirine û bi heft bedenên heft rengî dorpêç kirine.


HEREDOT (484-425) B.Z.

Li rojava, tixûbên xwe ta Deryaya Sor berfireh kirine.

Heredotê Yewnanî, beşeke mezin a dîroka xwe ji Medan re veqetandiye.

Tê texmînkirin, ku hemû Hûrî weke Med hatine binavkirin. Ji mezinahiya Medan re rêzdariyê nîşan dide.

Heredot, Persan di rêza duyem de dipejirîne. Ji ber ku yên mohra xwe ya çandî lê dane, Med bi xwe ne.

Pers, wê demê bi awayekî qels ku nû derketine ser dika dîrokê, bi riya çanda Hûriyan ji qeraxên Egeyê ta Îlamê, ji Qafqasyayê ta qesrên Misirê deng vedaye.

Zerdeşt

Heredot, vê rastiyê bi mafdarî di dîroka xwe de vedike.

Divê mirov **Zerdeşt** û rahîbên magî yên ku di derketina Medan de xwediyê cihekî girîng in jî baş nas bike.

Sincê azad ê Zerdeştî, destûra bingehîn e. Di têkbirina Asûr û bilindbûna Med û Persan de cihekî diyarker ê vî sincî heye.

Ji Çanda Medan

Ger ku daxwaza wan a jiyana azad nebûya, wê weke gelên din bi hêsanî dîl bibûna. Gelên ku di bin bandora civaka nûjen de mane, împaratoriya Med û Pers in.

Federasyona eşîrên Medan ên ku bi Babîliyan re hevgirtî tevgeriyane, di 612 B.Z. de împaratoriya Asûriyan hildiweşînin. Babîl, careke din û cara dawîn bi ser dikeve. Bi derbeya qesrê ya Kîrosê ku pismamê qralê Med Astiyag e, serweriya ramyarî cara yekem dikeve destê arîstokrasiya Persan a ku zêdetir li başûrê rojavayê Îranê bi cih dibin. Piştî demeke kin, di salên 550 B.Z. de bi avabûna împaratoriya Persê ya navendî û hêzdar re bi encam dibe.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Împaratoriya Med, li ku derê hatiye jiyankirin?**
2- **Împaratoriya Asûriyan, kengî û çawa hatiye hilweşandin?**
3- **Navê paytexta Med, çi bû û li ku derê bû?**
4- **Zerdeşt û rahîbên magî, di kîjan împaratoriyê de derketine?**

Wane 5

ÇANDA SEMÎTÎK

Çand û zimanê Semîtîk, li Erebistan û Asyaya Navîn di navbera salên 9.000 û 6.000 B.Z. de bi belavbûna bandora civaka neolîtîkê re derketiye holê.

Weke milekî girîng, em nikarin çand û zimanê Semîtîk piştguh bikin.

Ji aliyê şivanî û çanda eşîriyê ve dibe ku dewlemendtir be.

Ji vî aliyê xwe ve, ji çand û zimanê Aryenî pêşketîtir e.

Em di nivîsarên Sumeran de rastî şopên vê tên.

Di çand û ziman de avaniya destanî pêşketî ye. Nasnameya civaka eşîrî ya ku yekem car cuda dibe, weke asîman tê bilindkirin.

Pêkhatina peyvên weke; ‘**EL** û **Ellah**’ ku navê xweda ne, dibe ku di van deman de çêbûbe.

Dibe ku di çanda Semîtîk de sazî û têgehên ‘**şêx û seyîd**’ ji kevn ve teşe girtibin. Di dema şaristaniyê de ev wê veguherin saziyên weke ‘**pêxember û emîr**’an.

Tevî ku di qada Semîtîkê de cih digirin, di şaristaniya Fîrewn a Misirê de mirov tevkariya çanda Semîtîkê dibîne.

Em nabînin ku çanda şivantiyê, di demên 4.000 B.Z. de rê li ber çanda şaristaniya bajêr weke ya Misirê vekiribin û em rastî tu naverokên weke sazî û têgehên wê nayên.

Jixwe belgeyên Misirî jî, vê çandê ji xwe re gelek biyanî hîs dikin.

Di aliyê ziman de jî, her du ne weke hev in.

Çanda Semîtîkê, pêşî bi nasnameyên Akad, Babîl, Asûr, Kenan û Îsraîlê di dîroka nivîskî de cih digire. Piştî wê, nasnameya Aramî jî derdikeve.

Lê Aramî û Apîrû, zêdetir têgehên Sumer û Misiriyan in.

Di belavbûna şaristaniya Sumer de û li hemberî hev ku derketine, pêşketinên rastî di qadên cîran de hatine jiyankirin.

Li rojhilat û bakur; Horîtên Aryen û li rojava û başûr; ên bi navê Amorît ên Semîtîk, li hemberî dewlemendî û hêza Sumer a ku di navbera wan de derbeyên mezin li wan xistine.

Ji Çanda Semîtîk

Jiyana sazûmaniya gund a rûniştvanî, çandinî û sazûmaniya koçber a şivanî ya bi awayekî aram, di nava rewşeke mezin de ye. Lê belê, Aryen ne di wê rewşê de ne ku sazûmaniyê bi kûrahî dijîn. Sumeriyan, ev serdestiya xwe zû bi dest xistine. Hozên şivanî ên Amorît ku li dûrî jiyana hem çandinî û hem jî bajarî bûn û di mercên çolê yên zehmet de jiyan dikirin, li ber serê wan bihiştek hebû. Yan weke dîlên xizmetkar, an jî weke fatihên dagirker bi stûxwariya qedera xwe re rû bi rû ne.

Hîn li rojava, şaristaniya Misirê jî bi heman pêşketinan re rû bi rû ye. Bi rastî, pêvajoya ku Sumer daye destpêkirin jî, bi tevgerên van hozan ve girêdayî ye. Lê dema ku ew dibe serdest, gelek nakokiyan diafirîne.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Çanda semîtîk, kengî û li ku derê derketiye holê?
2- Çend taybetmendiyên çanda semîtîk binivîse.
3- Ji belgeyên ku derketine, çanda Misirê bi çi helwestê li çanda semîtîk dinêre?
4- Hozên şivantî yên Amorît, çawa jiyan dikirin?

Wane 6

ŞARISTANIYA MISIRÊ

Yek ji civakên koledar ên ku piştî Sumeran derdikeve jî, şaristaniya Misir û Nîlê ye.

Pêşketineke xweser a neolîtîkî ya şaristaniya Misirê, bi serê xwe pêk nehatiye. Gengazeke mezin e ku şoreşa çandî ya di Kevana Berhemdar de bi pêş ketiye, weke ku li her deverê belav bûye, di 6.000 B.Z. de gihîştiye vê herêmê.

Berhemên Nîlê, derfetê didin şoreşeke bajarî ya bi vî awayî. Her wiha, di reseniya wê de şopên şoreşa bajarî ya Sumerî tê dîtin. Lê rêjeya berhemdariya bilind, li Misirê di zûtirîn dem de rê dide ku avaniya xwe ya resen derxe holê.



Lê tevî vê reseniya xwe, ta ku şoreşa bajarvaniyê ya Sumer û şoreşa çandiniyê ya Kevana Berhemdar nebin, rastiyeke dîrokî ye ku şaristaniya Misirê bi serê xwe nikaribû derketiba holê û pêk bihata.

Li Misirê, mercên şoreşa çandiniyê ya resen tune bûn. Ger ev hebûya, ji ber mercên xwe yên ku naguherin, wê newala Nîlê ji berê ve bibûya dergûşa şoreşa bajar û çandiniyê û ne piştî şoreşa bajar û çandiniyê ya Mezopotamyayê, wê ji kevn ve bi pêş biketa.

Girîngiya Nîlê ya rastî, ji taybetmendiya axa gelekî berhemdar a ku bi avdanê gelek guncav e.

Dema ku teknolojiya çandiniyê ya pêwîst gihîştiye, pêvajoya şaristaniyê hem bi lez, hem jî resen jiyan kiriye.

Şaristaniya Misirê, nêzî 3.000 sal B.Z. dest pê kiriye, ta destpêka zayînê jî bêyî ku zêde biguhere, hebûna xwe berdewam kiriye.

Di warê geometrî, avahîsazî û cureyên nivîsê yên cuda de pêşketineke ji ya Sumeriyan cuda nîşan daye. Bi taybetî, di avahîsaziyê de xwedî serweriyeke ku mirov dikare bi ya Romayê re bide ber hev e.

Keştî Û Babir

Di warê keştî û babiran de jî pêşketî ne.

Hesabên wan ên demsal û salan, li gorî stêrkan tekûz in.

Sazîbûna dewletê tevî ku zêdetir navendî ye, lê ji bo gelek bajaran rê nade. Zêdetir kantoneke xweser e.

Ew jî, weke Sumeran ji aliyê sih xanedanan ve hatiye birêvebirin. Feraseta qralê Xweda, serwer e.

Avaniya mîtolojîk, li gorî Sumeran qelstir e û weke vedaneke sînordar bi pêş ketiye.

Li ser vê bingehê, avaniyeke serdest a bîrdoziyê saz dike. Ji ber vê yekê, kevneşopiya rahîbên Misirê ta îro gelekî bi hêz dijî.

Têkiliyeke bi armanca bazirganiyê ya bi Gîrît û Fenîkeyê re bandor dike, ku li van deran ev şaristanî pêş bikeve.

Di warê çemê sereke yê şaristaniyê de tenê di rista milekî bi hêz de ye. Lê di pêşketina şaristaniya koledar de weke xeta sereke, ji 3.000 sal B.Z. ta zayînê, yek ji xwediyê para sereke ye. Cihê wê yê di xwedîkirina şaristaniya Grîkê de kêmtir e û ne rasteraste jî, di şaristaniya Romayê de nayê piştguhkirin.

Tevî ku nikaribûye Efrîqayê ji şaristaniyê re veke, di nav re bazirganî bi pêş xistiye.

Bazirganiya babiran; li Nîl, Deryaya Sor û Deryaya Spî ji bo destpêka pêşketinê, gelekî deyndarê şaristaniya Misirê ye.

Misir, tevî ku li gorî Sumeran di sazkirina mîtolojiyê de gelekî xizan e, di pêşketina olên yekxwedayî de xwedî cihekî girîng e.

Pîramîtên Misirê

Çîna rahîban a Misirê, bi ristên xwe yên gelekî hêzdar ên perwerdekariyê ve, di ol û mîtolojiya Grîkan, di rewşeke navendî ya gihandina kadroyan de ye.

Ta sedsala 5. B.Z. jî, pêşengên feylozof û rahîbên Grîk, zanînên xwe bi piranî ji perwerdeyên li Misir û Babîlê girtine.

Şaristaniya Misirê, di warê sazûmaniya koledar de berhemdar û domdar e.

Di kûrkirina koledariyê de pêşketî ne. Bi taybetî, di çêkirina pîramîtan ên ku bi keda koleyan hatine avakirin de.

Bi qasî ku koledarî kiriye, xwedî erkeke gelek kûr a ramyarî û olî jî bi hêz serwer kiriye.

Di dîrokê de di pêşketin û derketina sazûmaniya koledar de cihê Sumeriyan çi qas diyarker be, di xurtbûn û domdariya wê de jî cihê Misirê ew qas girîng e.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Şaristaniya Misirê, kengî dest pê kiriye?**

2- **Girîngiya Çemê Nîlê ya ji bo Misirê diyar bike.**

3- **Şaristaniya Misirê, di kîjan warî de ji Sumeran pêşketîtir e?**

4- **Hevokên li jêr ên şaş, sererast bike.**

- Yek ji civakên koledar ên ku piştî Mîtaniyan derdikeve, şaristaniya Misirê ye.
- Şaristaniya Misirê, di warê keştî û babiran de pêşketî ye.
- Şaristaniya Misirê, weke Sumeran ji aliyê çil xanedanan ve hatiye birêvebirin.
- Çîna rahîban a Misirê, bi ristên xwe gelekî bihêz in.
- Sumer, li gorî Misirê di sazkirina mîtolojiyê de gelekî xizan e.
- Çêkirina pîramîtan, bi keda qralan hatiye avakirin.

Wane 7

ŞARISTANIYA ÇÎNÊ

Çîn a ku dikeve nava tixûbên rojhilata Asyayê, serdema neolîtîkê ya li Kevana Berhemdar, di salên 4.000 B.Z. de nas kiriye.

Çemê Zer (îro bi navê Huang Ho ye), bi berhemdarî û tekûziya guncav a avdanê re rista Nîla Misirê dilîze.

Erdnîgarî û avhewa, li derveyî avdana çêkirî, ji bo çandiniyê guncav e.

Li Çînê, di salên 1500 B.Z. de împaratoriyeke hêzdar a li ser pêşketina civaka çîndar derketiye û bi qasî xanedanên Misirê di rewşeke tund û navendî de bi pêş ketiye.

Gelek qonaxên parçebûn û navendîbûnê derbas dike û xwe digihîne ta roja me. Tevî ku tevkariyeke wê ya rast ji şaristaniyê re nehatiye xuyakirin, dikare reseniyeke xwe bi xwe ya ku têra xwe dike jî domdar bike.

Di destpêka zayînê ya di dema Romayê de, her ku diçe di asteke baştir de dikare tevî coka sereke ya şaristaniyê bibe.

Riya hevrîşmê ya dîrokî jî, ji ber cihê wê ku di vê dewlemendiyê de digire, pêk tê. Dîrokên ku ji bo derketina şaristaniya koledar a Çînê tên texmînkirin, nêzî salên 1.500 B.Z. ne.

Em dikarin destnîşan bikin ku împaratoriya navendî ya mezin a destpêkê, di vê dîrokê de ava bûye. Tê de gelek pîrozî hene û tê wateya Ûrûka Çînê. Em dibînin ku di 1.000 B.Z. de weke Sumer û Misiriyan piştî dema avabûnê; berfirehbûn û piştre jî belavbûn pêk tê. Di vê dema duyem de dewleta bajêr ava dibe. Şerên bajaran ên gur û geş ên weke demên Ûr ên Sumeran pêk tên.

Di dema sêyem (250 B.Z. û 250 P.Z.) de xanedanên navendî ji nû ve bi hêz dibin.

Ji bo ewlehiya împaratoriyê jî, pêwistî bi avakirina bedeneke dirêj a li derdora wê hebû. Ev beden, di serdema xanedanê bi navê Tişîn de hatiye avakirin. Di salên 256-206 B.Z de bi dirêjahiya 2500 km û bilindahiya 7 m û firehiya 4,5 m.

Bedena Çînê

Di dema feodalîteyê de xanedanên navendî giraniya xwe didin û ta destpêka sedsala bîstemîn, bi awayekî tund berdewam dikin.

Di vê demê de tê dîtin ku şaristaniya Çînê di 500 P.Z. de li ser Çîna-Hindî, giravên Japonya, Asyaya Navîn û Moxolê belav dibe.

Mirov dikare bi zanyarî jî bêje, Konfuçyûsê ku di 500 B.Z. de jiyan kiriye, hewl dide ku sinc û rêgezên sazûmaniya dewlet û bajaran ên gelek nûjen saz bike.

Dewlet, ji zagonên fermî yên karîgeriya civakê wêdetir, bi fêrkariya rêgezên sincî yên saxlem ve girêdayî ye.

Konfuçyûs

Çîn di şaristaniya heyberî de pêşketinên girîng pêk anîne. Di pêşketinên pîşesaziyê de beriya rojava(Ewrûpa) pêş ketine.

Mînak: Kaxez, çapxane û barût vedîtinên wan in.

Li rojhilat, bazirganî cih girtiye ku Riya Hevrîşm a dîrokî lê dest pê kiriye.

Hevdîtina wan a bi şaristaniyên Rojhilata Navîn re, sedsalên pêşî yên B.Z. û P.Z. ne.

Vebûna wê ya ji kapîtalîzmê re di nîveka sedsala 19'an de ye.

Îro jî, weke dêwekî mezin dibe, bi mereq tê temaşekirin ka wê çawa belav bibe.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Şaristaniya Çînê, kengî hatiye naskirin?**

2- **Zagonên fermî yên dewletê, bi çi ve girêdayî ne?**

3- **Dewleta Çînê, bi kîjan pîşeyan navdar e?**

4- **Şaristaniya Çînê, çima bedena dirêj ava kiriye?**

5- **Şaristaniya Çînê, di salên 500 B.Z. de li ku derê belav bûye?**

6- **Çend vedîtinên Çînê yên navdar binivîse.**

Wane 8

ŞARISTANIYA FENÎKEYÊ

Fenîke (welatên Kenan), weke koloniya Qadeş a li Anatolyayê, di serî de xwe dispart Bîblos, Teyr û kolonîkirina li bajarên Ûgarîtê pêk tê. Li van deran, pêkhatina koloniyên etnîkî yên tevlîhev pêk dihatin, tê dîtin.

Ji Çanda Fenîke

Weke Lubnana niha, ji destpêka xwe ve bi çandeke kozmopolît serwer e. Lê di rewşeke resen de jî dihat jiyankirin. Bi giştî, di bazirganiyê û bi taybetî jî bazirganiya Deryaya Spî de weke mirovên deryayî bêtirs û jêhatî bûn.

Di 2.000 B.Z. de xwedî dewletên xwe yên bajêr bûn. Ev dewletên bajêr ên ku derdora wan bi deryayan dorpêçkirî bûn, bi piranî di bazirganiyê û rêza duyem de jî di pîşekariyê bi taybetî di dartiraşiyê de pêşketî bûn.

Keştîvaniya Fenîkeyiyan navdar e. Di asta sazîbûnê de li gelek qadên qiraxên Deryaya Spî koloniyên bi xwe ve girêdayî çêkiribûn.


Alfabeya Fenîke

Tevkariya wan a herî girîng ji dîrokê re alfabeya Fenîke ye.

Ev alfabe, di bingeha gelek alfabeyên ku îro tên bikaranîn de weke mînak hatiye girtin.

Tevî ku mîtolojiya Sumeran bandorkera resen e, reseniyeke Fenîkeyiyan a balkêş heye. Xwedayê wan ê herî mezin 'ÎL' e (Ellah, ji vê derê tê).

Piştî wî, xwedayê hêzê Baal û xwedayê mirinê Mod tê.

Îştar, bi navê Astarte jiyan dike.

Çanda Fenîkeyê; piştî Sumer û Misirê, bi çanda Grîk, Roma û îslamê re li gorî reseniyeke bi têgeheke domdar, bandora xwe ta îro jî aniye.

Di bingeha çanda laîk a Lubnanê de taybetmendiyên şaristaniya Fenîkeyê hene. Di dîrokê de di pêkhatina şaristaniya Gîrît û Kartacayê de xwedî pareke girîng e. Yên ku çanda Grîk herî zêde xwedî kirine, Fenîkeyî ne. Di ragihandina alfabe û mîtolojiya Rojhilata Navîn a ber bi Grîkan de rista girîng Fenîkeyiyan lîstine.

Baal Xwedayekî Fenîkeyiyan

Di herêmên hundir ên deryaya Spî ya rojhilat de, di serî de bajarên weke; Qûdis, Şam û Heleb di rêza duyem de nifşeke bajarbûnê ya din jî pêk tê.

Ev bajarbûnên ku li ser bazirganiyê ne, di navbera nîvgirava Erebistan, Anatolya û Deryaya Spî de weke navenda bazirganiyê derdikevin pêş û derdorên wan ên nêzik jî, ji çandiniyê re gelek guncav in. Ev nifşa şaristaniyê, weke navendên ragihandin û têgihîştina çandan, xwedî cihekî diyarker in. Bi giranî, avaniya ziman a hozên Semîtîk ên rojava serwer e. Nasandina wê ya vê avaniya pirçandî, êdî bi saya van mercan guncav e. Di 1.500 B.Z. de weke giştî Rojhilata Navîn, di vê nifşê de jî tevgerên nûjeniyê yên bi şêwaza dewletên bajêr, di lûtkeyê de ne.

Ji ber mercên erdnîgariyê; serdestiya Babîl, Asûr û Misiriyan bi tevahî nas nekirine.

Hê jî bi saya dîplomasiyê, di navbera her sê aliyan de lîstine û bi vî awayî, serxwebûna xwe berdewam kirine. Lê her hoza ku ketiye zorê, ji ber vê taybetmendiya xwe, ji aliyê rêberê wê ve, xwe kişandine van deran û karibûne di rêjeyekê de azadî û reseniya xwe biparêzin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Fenîke, di kîjan warî de bêtirs û jêhatî bû?**

2- **Piştî xwedayê Fenîke yê herî mezin 'ÎL', kîjan xweda tê?**

3- **Bingeha çanda laîk a Libnanê, ji ku derê tê?**

4- **Çima Fenîke; serdestiya Babîl, Asûr û Misiriyan bi tevahî nas nekiriye?**

Wane 9

ŞARISTANIYA GRÎKO-ROMEN

Roma

Şaristaniya Grîko-Romen, di dîroka şaristaniya navîn de her du weke hev nûnertiya qonaxa gihîştibûnê dikin û mirov dikare bêje; şaristaniya dema kevnar jî.

Vê şaristaniyê, karibû çalakiyên herî serkeftî yên potansiyelên şaristaniyê bi pêş bixe.

Li gorî serdema xwe, dema xwe ya herî biheybet, çanda daringî afirandiye û gihîştiye sentezeke herî serkeftî ya çandên daringî.

Di warê heybetiyê de hîn jî zehmet e, ku mirov dikare bêje gihîştiye çandeke heyberî ya ku bi Romayê re were pîvan.

Pîşesaziya kapîtalîst a ku weke şoreşekê tê destnîşankirin, ne şaristanî ye, lê belê ew nexweşiya şaristaniyê ye.

Atîna

Serdema Atînayê jî, dawiya çanda bîrdozî ya serdema pêşîn diyar dike. Bi aliyekî xwe ve felsefe; encama vê rastiyê ye.

Panteon, di zîgûratan de cihê herî bilind ê desteya xwedayan ku nirxên çandî û bîrdozî yên xwedawendan bi temamî ji destên wan tên standin. Weke ku di her tiştî de jî wisa ye, di dema lûtkeyê de bi rewşeke vî awayî re rû bi rû mane, tê têgihîştin ku dawiya her lûtkeyê ketin e.

Misoger e ku koledarî, tam sazûmaniya çanda heyberî ye.

Ketina mirovahiyê, encama vê sazûmaniyê ye. Ketineke ev qas bi kûrahî ye ku di cîhana tu giyanweran de nayê dîtin.

Ji ber vê yekê, ev bûye sedema hilweşîna wijdanê, bi talan û heybeta çanda heyberî ve hatiye girêdan.

Li hemberî abîdeyên pir mezin ên wê çandê, hîn jî mirov bi kelecan dibe. Ji aliyê din ve ne gengaz e ku mirov matmayî jî nebe.

Di kolekirina jinê de jî; jin ji nirxên xwe yên hilberînker, fêrker, rêvebirin û azadîxwaz ku ew qas bi sazûmanî bû û bi gelek cureyên amûrên tundiyê jî, jin hatiye (tevî gotinên evîndariyê) hincirandin.

Bi tevahî, windakirina nasnameya wê, vediguhere rastiyeke gelek cuda, vediguhere 'jinoyîbûnê'.

Jinoyîbûn jî, ew e ku ta dawiyê mafê gotinê heye (kengî bixwaze wê bikuje jî tê de). Ew ne tenê milk e, milkekî gelek taybet e.

Bandorkeriya duyem a girîng jî, ew e ku dixwazin ceribandina serkeftî ya ku di jinê de pêk anîne, li ser civakê jî bisepînin.

Civak, diviyabû ji bo efendiyên xwe weke jinekê karibe were bikaranîn be. Jinoyîbûna civakê, di sazûmaniya kapîtalîst de hatiye sergihayîkirin. Lê bingeha vê çalakiyê, di şaristaniyên pêşîn de hatiye avakirin.

Di çanda Grîko-Romen de jî, xwestine ku weke mînakeke civaka serfiraz pêşkêş bikin. Tenê bi jinoyîbûna zilam re, mirov dikarîbû behsa jinoyîbûna civakê bikira.

Grîko-Romen ku diviyabû civakeke baş bide û li gorî wê bergiriyên xwe girtibûn, rewşa koleyan a jinê gelek hat xerabkirin. Lê pirsgirêka bingehîn a di civaka wan de ew e ku jinoyîbûna zilamê ne kole bû.

Modaya di civaka klasîk a Yewnanê de ew bû ku diviyabû ji bo her zilamê ciwan ê azad, evîndarekî wî yê zilam hebe.

Ev zilam, ta ku bibûya xwedî ezmûn, diviyabû ku bibe evîndarê yekî.



Sokrates

Ji ber vê yekê jî, Sokrates dibêje; ne bikaranîna lawikê ciwan e, ya girîng jiyankirina wî ya giyanî ye. Ji ber ku civaka kole, wê bi rêgezên rûmet û azadiyê re bi hev nekin. Ji ber vê yekê, diviyabû ev taybetmendî ji civakê bihatana paqijkirin û rastiyeke ku li cihê azadî û rûmeta mirov lê hebe, koletî nayê jiyankirin.

Bêguman, çanda Grîko-Romen nikarîbû vê erk û ristê sergihayî bike. Di nava xwe de Xiristiyaniya ku bi dibistanên felsefeyê yên azad re bi pêş diketin, ji derve jî serhildan û êrîşên etnîsîteyê yên ku dawî lê nayên, wê civakê bi rewşên din re rû bi rû bihişta.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Şaristaniya Grîko-Romen li gorî serdema xwe, di dema xwe ya herî biheybet de kîjan çand afirandiye?**
2- **Li gorî şaristaniyê, rista pîşesaziya kapîtalîst çi ye?**
3- **Felsefe, di kîjan serdemê de hatiye diyarkirin.**
4- **Jin, di dema Şaristaniya Grîko-Romen de çawa dihat dîtin?**
5- **Sokrates, ji bo jinoyîbûna zilam û civakê, çi daxuyanî daye?**

Wane 10

EMERÎKA

Di veqetîna parzemînî ya şaristaniyê de ya ku bûye para Emerîkayê, di salên 3.000 B.Z. de hevnasîneke bi Neolîtîkê re û di sedsala 5. P.Z. de jî derbasbûna şoreşa bajarvaniyê bûye.

Parzemîna ku di nava xwe de pêşketineke sînordar jiyan kiriye, rista xwe ya li tevahiya cîhanê, encax li ser kolonîkirina kapîtalîzma Ewrûpayê bi awayê pir dereng û herî dawî di sedsala 20. de wê di pêşengiya Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê (DYE) de bilîze.

Kristof Kolomb

Emerîka, di sala 1492'yan de ji aliyê **Krîstof Kolomb** ve hatiye vedîtin.

Cihbûna destpêkê, ji aliyê Ingilîzan ve di sala 1607'an de dest pê kiriye. Li ser cîhana nû (Emerîka) Portekîz û Ispanya xwestine dagirkeriya yekdestî pêk bînin. Ji ber pirsgirêka ku wê koloniyên Îngilistanê yên li Emerîkayê kî kontrol bike, şerê 7 salan dest pê kiriye. Îngilistanê, piştî ku di encama vî şerî de Fransa bi bin xistiye, bi Peymana Parisê (1763) re tevahiya Emerîkaya Bakur bi dest xistiye.

George Washington

Dema ku Îngilistanê dît, di şerê koloniyan ê ku di bin fermandariya "George Washington" de tê birêvebirin, wê nikaribe bi ser bikeve, serxwebûna Emerîkayê di sala 1782'yan de pejirandiye.

DYE’yê bi çavkaniyên bêsînor ên xwezayê re pêş ketiye û di sala 1867’an de hema bêje gihîştiye sînorên xwe yên îro.

Serxwebûna Emerîkayê, ji bo gelên ku dixwazin girêdana xwe ji dagirkeran qut bikin, bûye mînak.

Destpêkê Emerîkaya Latînî, piştre jî gelên di nava Împaratoriya Îngilistanê û di sedsala 20’an de jî ji gelên bindest ên Asya û Efrîqayê re bûye mînakeke rênîşaner. Avabûna DYE’yê nîşan daye ku gelek hizirên Ewrûpayê yên ronak, dikare werin pêkanîn.

Piştî şerê Emerîkayê yê hundirîn (1862-1865) û şûn de DYE bi lez pêş ket û ji aliyê aborî ve jî bi lezeke bilind dest bi mezinbûnê kiriye.

Sedema mezinbûna aliyê aborî ew e, ku ji welatên din hin sûdên wan hene. Ji bo pîşesazîbûna xwe, pêwîstiya wê bi şênî û çavkaniyên xwezayî heye.

Bikaranîna teknolojiya herî bilind, ji DYE’yê re bûye mezinbûnek.

Piştî sala 1890’î pîşesazîbûna elektirîkê ji aliyê "Thomas Alva Edison" ve hatiye vedîtin. Kîmya pêş xistine û otomobîl ji aliyê "Henri Ford" ve hatiye pêşxistin.

Di sedsala 20’an de pîşesazîbûna giran ava kiriye.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- **Emerîka, kengî û ji aliyê kê ve hatiye vedîtin?**

2- **Emerîka, ji aliyê kîjan dewletan ve hatiye dagirkirin û kengî serxwebûna xwe bi dest xistiye?**

3- **Zagona bingehîn a Emerîkayê, li ser kîjan rêgezê hatiye nivîsandin?**

4- **Piştî sala 1890'î kîjan pîşesazî pêş ketine?**

FERHENGOK

A

Abîdeyên dêwî: Ew bermahiyên dîrokî yên pir mezin ku ta niha mane.
Afirînerî: Çêkirina tiştekî nû.
Ajo: Taybetiyên zindiyan ên ji dayîkbûnê û xwezayî, bêyî ku vîna wan ristê bilîze.
Amorît: Di zimanê Sumeran de tê wateya gelên rojavayî, koka Amorîtan ji koçberên semîtîk tê.
Apîrû: Gelê hezretî Mûsa û bi zimanê Erebî ji wan re Ibranî tê gotin.
Atom: Parçeya herî biçûk a heyberan ku bi çavan nayê dîtin, lê bi riya mezinkerê tê dîtin.
Arî: Kesên ku ji nifşên Aryen in.
Arkeolojî: Zanista ji bo vedîtina bermahiyên dîrokî yên binerd.
Arîstokrasî: Çîna serdest(dewlemend-xanedan) a di nava civakê de. Mînak: axa, beg û hwd.
Aşop: Xeyal
Avanîsaziya jêr: Binesazî

B

Batman: Bajarekî li Bakurê Kurdistanê ye.
Baviksalarî: Dema ku bav bi tena xwe rêveberiya malbatê yan jî saziyekê dike.
Beden: Dîwar, sûr, sênc.
Belûcî: Gelê Belûcistanê.
Binesazî: Pêwîstiyên (av, tenduristî, perwerde, rê û hwd.) ku ji bo jiyana civakî tên amadekirin.
Binpêkirin: Pêkneanîn û xerabkirina maf û biryaran.
Bergirî: Tedbîr
Bîblos: Bajarekî Lubnanê ye, navê wî yê îro Cibêl e û 37 km dûrî Beyrûtê ye.

Burokrasî: Têgeheke ramyarî ye, tê wateya sepandina zagonan a bi darê zorê ya bi awayekî hiyerarşî.

Ç

Çayonu: Bajarekî kevnar ê Bakurê Kurdistanê ye. 7 km nêzî bajarê Erxaniyê û 40 km dûrî bajarê Amedê ye.

Çemê Xalan: Li Bakurê Kurdistanê, nêzî Batmanê ye

Çîna-Hindî: Îro bi navê dewleta Vêtnamê tê naskirin.

D

Dahurandin: Analîzkirin.

Dema kalkolîtîkê: Ew dema ku mirovên destpêkê çek û amûrên malan û çandiniyê ji cureyên hesin û sifirê çêdikirin.

Derbasdar: Bi awayekî rojane.

Derbasok: Riya di navbera du çiyayan an jî tiştan de.

Derbeye qesrê: Dema ku serweriya qralekî, bi destê endamekî ji heman malbatê di qesra wî de bi darê zorê tê guhartin.

Derûnî: Raman û hişmendiya di serê mirov de.

Dêw: Lawirekî hovane û gelekî mezin e, sembola şer e.

Dol: Gelî, newala di navbera du çiyayan de

E

Eger: Sedem

Ekolojî: Zanista ku hawîrdor û avhewayê lêkolîn dike.

Endustriyel: Heyberên çêkirî.

Endustriyalîzma kapîtalîst: Sîstemeke aborî ye ku hilberîn û amûrên wê di destê çend mirovên kapîtalîst de ye û pê li ser civakê serdestiya xwe kontrol dikin.

Erxanî: Bajarekî kevnar e, nêzî bajarê Amedê ye.

Î

Îştar: Xwedawenda hezkirin û xweşikbûnê ye ku di dema Babîl de jiyan kiriye. Bi Aryenî; bi navê Star, bi Sumerî; Înana û hwd.

F

Federasyon: Şêweya yekîtiya siyasî ya eyalet, saziyên sivîl û partiyan. Di vê yekîtiyê de her pêkhate xweseriya xwe diparêze.

Felaket: Karesat, bûyereke mezin a ku tê de xem û neşadî heye.

Fişartin: Zextkirin, dextkirin.

Form: Şêwe, awa, teşe.

G

Gîrît: Giraveke ku li Deryaya Spî ye.

H

Hemdem: Nûjen.

Hilberîn: Berhemên ku bi keda mirov û ji xwezayê tên holê.

Hincirandin: Zordestî lê kirin.

Hiyerarşî: Pergala çîneyatî ye, ku di dema Sumeran de dest pê kiriye û ta niha didome.

Hoz: Qebîle.

J

Jinoyîbûna zilam: Dema zilam bibe weke jinekê bêyî vîna wî.

K

Kan: Cihê ku heyberên weke; hesin, sifir û hwd. jê derdikevin.

Karîgerî: Piratîkî.

Kapîtalîzm: Pergaleke ku di rêvebirina dewlatan de xwe dispêre yekdestiyê.

Kedkarên çolterê: Mirovên ku li herêmên derdora çiyayan kar dikin.

Kereste: Darên ku ji bo avakirina xaniyan tên bikaranîn.

Klan: Koma mirovên destpêkê ku ji 20-30 kesî pêk tê.

Kolonî: Cihekî ku ji aliyê dewlet an jî civakekê ve hatiye dagirkirin.

Komînal: Sîstemeke ku di civakê de her mirov karê xwe bi awayekî hevbeş dike, bêyî ku desthilatdarî hebe.

Kozmopolît: Nasnameyên etnîkî yên cur bi cur ên ku li bajar û koloniyan jiyan dikin.

L

Laîk: Têkilhevnekirina karên dewlet û yên olê.

Lûtke: Cihê herî bilind.

M

Matmayî: Ecêbmayî.

Metin: Nivîsar, ango tabloyên kevnar ên ku ji bo nivîsandinê yên beriya zayînê dihatin bikaranîn.

Mîtolojî: Peyveke yewnanî ye û tê wateya zanista efsaneyê.

P

Paleolotîk: Serdema kevirî ya destpêkê.

Panteon: Navê perestgehên herî mezin ên Roma û Yewnaniyan. Yan jî, di zîgûratan de cihê herî bilind. Hemû xwedayên olên pirxwedayî, yan jî desteya xwedayan.

Pişaftin: Asîmîlasyon, an jî weke helandin û windakirina ziman, çand an jî neteweyekê.

Piştrastkirin: Tekûzkirin.

Pîşekarî: Pêkanîna pîşeyekê, yan jî bi zanistî çêkirina berheman. Weke; hesinkarî, xerat, pelçîmkirin û hwd.

Potansiyel: Hêza veşartî ya di hundirê heyberekê de.

Q

Qadeş: Bajarekî ku 24 km dûrî bajarê Humsê û li ser Çemê Elasî ye.

Qût: Berhemên çandinî yan jî lawirvanî yên ku tên komkirin û piştî demekê tên bikaranîn. Mînak: Qûtê salê.

R

Rabirdû: Dema borî.

Rave: Îfade

Rûniştvan: Niştecih, mirovên ku li cihekî dijîn.

S

Sazûman: Rêxistin, sîstem.

Sepandin: Ferzkirin.

Sentez: Berhema nû ya ku ji gelek diyardeyan çêdibe.

Sermayedar: Mirovê xwedî milk, weke; kargeh, pere û hwd.
Stûxwar: Mirovên ku bê rûmet dibin.
Sumer: Civaka yekem a di dîrokê de ku dewlet ava kirine û bi awayekî nivîskî dîrok nivîsandine.

Ş

Şaristanî: Şêwaza avabûna medeniyetê, civaka pêşketî.

T

Tampon: Cihê ku lê aramî heye, herêma bi ewle.
Tekûz: Karekî bê kêmasî.
Tempo: Leza tiştekî.
Teşe: Awa, şekil
Totem: Sembola baweriya mirov û hozên destpêkê yên weke; kevir, genim, dar, jin, baran û hwd.
Teyr: Bajarekî dewleta Lubnanê û 70 km dûrî Beyrûtê ye ku îro bi navê Sûr tê naskirin.

V

Vedîtin: Kifşkirin.

Û

Ûrûk: Paytexta Sumeran bû, bajarê herî kevn ê di dîrokê de ku bi şaristaniyê re dest pê kir, 40 km nêzî bajarê Ûr ê Îraqê ye.

X

Xanedan: Malbata ku ji nifşekî ta nifşekî rêveberiya dewletê dike.
Xembar: Xemgîn

Z

Zîgûrat: Di dema Sumeran de avahî-cihê rêveberiya civakê.

BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ

Hefte / Meh	Hefteya yekem	Hefteya duyem	Hefteya sêyem	Hefteya çarem
Rezber			Çand çi ye?	Çand û jiyana civakî
Cotmeh	Nirxên çandî yên bingehîn yên mirovahiyê	Di çandê de taybetmendiya gerdûnîbûn û herêmîbûnê	Belavbûna çandê	Qada hizir û ziman
Mijdar	Qada aborî û hunerê	Qada polîtîkayê	Qada zaniest û teknîk-teknolojiyê	Sinc çi ye?
Berfanbar	Di nava civakê de hizirandina baweriyê û girêdana bi sinc re	Sinc wijdanê civakê ye	Di sinc de azadî	Di sinc de berpirsyaretî
Rêbendan	Têkiliya ol bi sinc re	NIRXANDIN	BÊHINVEDAN	BÊHINVEDAN
Reşemeh	Vegera sincê civakî	Aliyên sincî yên têkoşînên azadiyê-1	Aliyên sincî yên têkoşînên azadiyê-2	Erdnîgariya Mezopotamya û çanda aryen
Avdar	Belavbûna çanda Aryen	Civakên etnîkî yên li Mezopotamya -1	Civakên etnîkî yên li Mezopotamya-2	Çanda semîtîk
Cotan	Şaristaniya Misirê	Şaristaniya çînê	Şaristaniya fenîkeyê	Şaristaniya Grîko-Romen
Gulan	Emerîka	NIRXANDIN		